## Ne li gorî pîvanên gerdûnî ne

Platforma Çareseriya Demokratîk û Aştiyê têkildarî girankirina tecrîda li ser Ocalan li avahiya DTP'a Stenbolê daxuyaniyek da çapemeniyê. Platformê girankirina şert û mercên tecrîdê wekî provakekirina pêvajoyê bi nav kir û wiha got: "Bi hestên herî hesas ên gelê kurd tê lîstin. Nêzîkbûna ji bo Rêberê Gelê Kurd Ocalan, nêzîkbûna ji bo gelê kurd e. Divê şert û mercên jiyan û tenduristiyê yên Ocalan demildest li gorî pîvanên gerdûnî bêne erêkirin."

## 'Hewldanên provokatîf in'



Bertek û nerazîbûnên li dijî şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ên li Girtîgeha Îmralî her ku diçin zêde dibin. Bi bertekan re nivîskar, rewşenbîr û parlamenteran jî bertek nîşan da û xwest mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bêne başkirin. Prof. Dr. Erol Katircioglu, şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ên li Îmraliyê weke hewldanên provokatîf nirxand. Nivîskar Temel Demîrer jî, nêzîkatiya ji bo Ocalan weke nêzîkatiya hikûmetê ya hewldana kurd ve girêda. *RÛPEL -5*

# Turk: AKP polîtîkaya înkarê dimeşîne

**Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk êrîşên nijadperest ên li hemberî kurdan, girankirina tecrîda li ser Ocalan û çûna Erdogan a Amerîkayê nirxandin û got Hikûmeta AKP'ê li hemberî kurdan polîtîkayên înkarê dimeşîne**

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk, ji ber bûyera Îzmîrê AKP sûcdar kir. Turk, got ku bi vê êrîşê hatiye xwestin ku peyama "DTP û MHP siyaseta dijber dikin. Em jî ji bo Tirkiyeyê misogeriya îstikrarê ne" bê dayîn. Turk, der barê şert û mercên Ocalan de jî hikûmet hişyar kir û got Ocalan ji bo kurdan hesasiyeta herî mezin e û divê ev yek li ber çavan bê girtin. Turk, der barê serdana Erdogan a ji bo Amerîkayê ku dê di 7'ê kanûnê de pêk bê jî got ku çareseriyek bêyî kurdan ne mimkûn e û divê daxwazên kurdan li ber çavan bên girtin... *RÛPEL - 5*




# ROJEV

2 Kanûn - Çarşem 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 20


## AKP taklîda şefên cûntayê dike

Hikûmeta AKP'ê û çapemeniya wê êrîşa li hemberî DTP'ê weke bûyereke ku di nava DTP û MHP'ê de ye nîşan didin û li gorî vê yekê raya giştî tê beralîkirin. AKP di vê mijarê de nêzîkatiyeke bi zanebûn nîşan dide. Vê yekê li ser weşanên çapemeniyê yên Fetullah ku alîgirê AKP'ê ye mirov bi rehetî dibîne...

CEMAL ŞERÎK R.2

# 'Ji mafan bêpar e'

Parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, der barê şert û mercên Ocalan de serî li sazî û dezgehên mafên mirovan dan. Parêzaran got Ocalan ji mafên bingehîn bêpar e

### SERÎ LI SAZIYÊN MAFÊN MIROVAN DAN

Parêzerên Ocalan, bi armanca başkirina şert û mercên Ocalan serî li Lijneya Şopandina Girtîgehê, ÎHD, TÎHV, TTB, MAZLUMDER û Komîsyona Mafên Mirovan a Parlamentoyê dan. Parêzeran bi daxwaznameyekê xwestin şert û mercên Ocalan bêne başkirin û tecrîd bi dawî bibe.

### JI CPT'Ê RANDEVÛ XWESTIN

Parêzerên Ocalan ji CPT'yê jî xwest bi lezgînî hevdîtinê çêbike. Parêzeran, di nava meha kanûnê de ku di ragihandinên muwekîlê xwe ye raporekê bidin CPT'ê. Parêzerên Ocalan, ji Serdozgerê Komarê yê Bursayê û Wezîrê Dadê giştînameya Îmraliyê xwestin.

### GUNEŞ: DARBEYEKE SIYASÎ YE

Parêzerê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Omer Guneş beşdarî bernameyeke ROJ TV'ê bû û pêkanînên li hemberî Ocalan wekî darbeyeke siyasî bi nav kirin. Guneş, got ku hikûmet bi israr dixwaze Ocalan derveyî pêvajoyê bihêle û ev darbeyeke siyasî û hiqûqî ye... *RÛPEL - 4*



*Komên Aştî û Çareseriya Demokratîk ku li ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji Qendîl û Mexmûrê çûn Colemêrgê. Kom, li Colemêrgê ji aliyê bi deh hezaran ve hatin pêşwazîkirin. Di çalakiyê de kiryarên li hemberî Ocalan hatin şermezarkirin. Endama Koma Aştiyê Elîf Uludag, diyar kir ku çareseriya hikûmeta AKP'ê neçareserî ye û bila kesek êdî sebra gelê kurd nepîve. Her wiha li navçeya Dêrîkê ya Mêrdînê jî bi hezaran kesî bi munasebeta şermezarkirina girankirina tecrîda li ser Ocalan, meşek li dar xist.*

## Li Sinê konferansa wêjeya kurdî

Konferansa navneteweyî li ser edebiyata kurdî li Sinê tê sazkirin û kesên bixwazin berhemên xwe bişînin konferansê divê herî dawî heta 20'ê adara 2010'an gotarên xwe bişînin...

ÇAND R9



## Ji Şêxo albuma 'Dengê Avê'

Ozan Şêxo bi navê 'Dengê Avê' albumek derxist. Şêxo, di albuma xwe de cih daye newayên herêma xwe Pazarcikê. Gotin û muzîka 6 berhemên albumê aîdî Ozan Şêxo ne...

ÇAND R9

# Di kuştina DTP'iyan de pirsên li benda bersivê

## Zext zêde dibin

Di nava 2 rojên dawî de polîsên tirk bi sedema protestokirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê meşandin bi ser malan de girt û ji 80'î zêdetir kes hatin binçavkirin... *R.3*



Piştî qeyda deng a aîdî endamê "Tîma Xençerê" û kiryarê bûyera kuştina endamên DTP'ê Necman Olmez û Ferhat Edîş ên ji devê Zekî Akdogan derket holê, hate îdiakirin ku rayedarên leşkeriyê li malbatê geriyane û gotine kurê we întihar kiriye. Her wiha ji ber Akdogan li leşkeriyê rastî gefan hatiye, bûyer avêtiye ser xizmên xwe yên cerdevan... *RÛPEL - 3*



## 'Greva li girtîgeha Edrayê dîrokî ye'

Fermandarê Biryargeha Navendî ya HPG'ê Nûredîn Sofî got greva li Edrayê berxwedaneke dîrokî ye

Nureddîn Sofî, li ser greva birçîbûna li girtîgeha Şamê ya Edrayê got ku berdewama pêşengên PKK'ê yên li girtîgeha Amedê ye û xeleka girîng a azadiya gelê kurd e. Sofî, ji bo vê çalakiya dîrokî bang li gelê kurd kir ku piştgiriyê bidin çalakiya mafdar ya girtiyên Edrayê û zexta dewleta Sûriyeyê ya li dijî gelê kurd, protesto bikin... *RÛPEL - 3*

www.arsivakurdi.org

## Şêwirgeh

Cemal Şerîk

# AKP taklîda şefên cûntayê dike

Êrîşa li Îzmîrê ya li hemberî konvoya DTP'ê, weke rojeveke bingehîn ji aliyê raya giştî ve hate nîqaşkirin û dan nîqaşkirin. Bi van nîqaşan re rê li ber nîqaşên nû hate vekirin. Di van nîqaşên têne kirin de, sedemê esasî yê êrîşên li hemberî konvoya DTP'ê raxistin berçavan. Di van nîqaşên li ser hiqûqê têne kirin divê pirsa herî zêde kî dê jê sûde bigere bê bersivandin. Dîsa bersiva ji bo vê pirsê bê dayîn, ji bo berpirsyarên bûyereke ku qewimiye bê dîtin ya xisûseke esasî ye. Di dozên li dadgehan tê vekirin de dozger, dadger, endamên juriyê darazê pêk tînin. Heke mudaxeleyek ji derve pêk neyê, ji bo bersiva vê pirsê divê xwe îkna bikin.

Failên esasî yên êrîşî konvoya DTP'ê kirin, heke li gorî qaîdeyên hiqûqê yên hêsan tevbigerin gihîştina berpirsyarên esasî mumkûn e. Li Tirkiyeyê ligel ku rêgeza vê hiqûqê têz anan, êrîşa li hemberî DTP'ê ber bi noqteyên cuda ve dibin û cuda nîqaş dikin. Di vê noqteyê de dixwazin di hiş de şêlûbûnekê çêkin, ji vê bûyerê ranteke siyasî bi dest bixin û sûdê jê bigirin. Ev yek jî herî zêde hikûmeta AKP'ê dike.

Hikûmeta AKP'ê û makîneya wê ya derewan çapemeniya desthilatdar, êrîşa li hemberî DTP'ê weke bûyereke ku di nava DTP û MHP'ê de nîşan bidin û li gorî vê yekê raya giştî tê beralîkirin. AKP di vê mijarê de nêzîkatiyeke bi zanebûn nîşan dide. Vê yekê li ser weşanên çapemeniyê yên Fetullah ku alîgirê AKP'ê ye mirov bi rehetî dikare bişopîne. Çapemeniya Fetullah ya alîgirê AKP'ê di vê pêvajoya em tê de derbas dibin de bi giranî li ser vê mijarê disekine û ev yek jî balê dikişîne.

Nîqaşên çapemeniya Fetullah ya alîgirê AKP'ê ku dimeşîne divê bi hêsanî neyê nirxandin. Bi van nîqaşan dixwazin bigihêjin hedefeke cuda. Dema mirov bi baldarî binêre dibîne ku dixwazin êrîşa li hemberî konvoya DTP'ê weke nediyar e nîşan bidin, failan veşêrin, ji bûyera qewimiye ne berpirsyar in nîşan bidin. Di encama dawî de weke bûyereke di navbera MHP û DTP'ê de ji raya giştî re pêşkêş dikin. Bi giştî bi vî rengî nîqaşan didin meşandin. Ev yek bi her awayî dê encamên bi talûke biafirîne, rastiya lîstika tê lîstin jî nîşan dide.

Kesên êrîşî konvoya DTP'ê kirine faşîstên hatine zêrandin in û bi awayekî organîze tevgeriyane. Nasnameya van kesan jî diyar e. Daneyên ku cihê bûyer lê qewimiye, berteka polîsan a li hemberî bûyerê, piştî bûyerê daxuyaniyên hatin dayîn, sedemê pêkanîna bûyerê û kesên ku bûyer pêkanîne bi têra serê xwe hene. Ligel vê yekê bi israr DTP weke ku berpirsyar e, kesên ku êrîş kirine weke kesên bêçare yên hatine tahrîkirin dixwazin nîşan bidin. Tabî ev yek hem ji aliyê raya giştî û derdorên hestiyar tevdigerin re ne xerîb e. Berê jî li metrepolan li hemberî gelê me êrîşên pêk hatine de AKP û yê serokê wê R.T. Erdogan ketibûn nava hewldanên heman rengî. Dîsa wê demê jî kesên êrîş kirine na, weke Nasreddîn Xoce yê sûcdar qadî bû, kesên mexdûr bûne weke berpirsyar nîşan dide.

Êrîşên li hemberî DTP'ê, nêzîkatiyên ên bûyer berovajî kirine û ji rastiya heyî cudatir nîşan dide hatiye deşîfrekirin. Lê nîşaneyên yên vê nêzîkatiyê ku dê di geşedanên ku biqewimin de nîşan dide hene. Aliyê ku mirov bi baldarî bişopîne yên êrîşa li hemberî DTP'ê pêk hatî de ev yek e.

Hêza MHP'ê û teşkîlata derdora MHP'ê tê zanîn. Rola ku ji aliyê dewletê ve hilgirtine ser milê xwe bi cih tînin. Ji ber vê yekê tiştê ku ji wan re tê gotin bi cih tînin. MHP, di salên 1980 û beriya salên 1970'ê de ji aliyê dewletê ve bi êrîşkirina li ser hêzên demokrat û astengkirina hêzên demokrat hatibûn peywirdarkirin. Bi vî rengî dihat xwestin ku helwesta dewletê ya li hemberî civakê wekhev û bêalî bidin xuyakirin. Beriya sala 1980'an ev yek bi avayekî pir aşkera pêk hat. Dewletê çeteyên faşîst bi rêxistin kir û dest li pişta wan xist. Bi vî regnî êrîşî demokratan kirin û li welêt pevçûna çepgir û rastgiran afirandin. Bi vê polîtîka û hewayê di 12'ê Îlona 980'an de cûntaya faşîst a leşkerî bi rêxistin kirin.

Bi vî rengî cûntayê êrîşên faşîst ku bi rêxistin kiribûn wekî sedema darbeyê nîşan da. Niha Hikûmeta AKP'ê jî heman polîtîkayê dimeşîne. Wekî cûntaya 12'ê îlonê MHP'ê û rêxistinên derdora MHP'ê bikar tîne û dixe nava pevçûnê. Hikûmeta AKP'ê ku ji aliyê Amerîkayê ve hatiye birêxistinkirin û sazkirin tam dişibe cûntaya faşîst ya 12'ê Îlonê ya leşkeriyê.

Komên faşîst ku li derdorên MHP'ê xwe birêxistin dikin û piştre êrîşî DTP'ê û kurdan dikin, ji ber vê rastiya AKP'ê û polîtîkayên AKP'ê ne. AKP wekî cûntaya 12'ê îlonê ya faşîst tevdigere. Rastgiran bi destê AKP'ê bi riya MHP'ê êrîş biriye ser çepgiran. Bi vê pevçûna ku ew di navde xuya nabe xwe dide jiyandin û sedema hebûna xwe daye nîşan. Ji aliyê her kesî ve hate fêmkirin ku AKP polîtîkayek çawa dimeşîne. Gel êdî fêm kiriye ku 12'ê Îlonê belayek ku li serê wan hatiye gerandin û niha têkoşîna ku xwe ji vê belayê rizgar bikin didin. AKP, şefên cûntaya 12'ê Îlonê ji xwe re esas digire. Lîstika cûntaya 12'ê îlonê dilîze û komên faşîst ên ku li dora MHP'ê xwe bi rêxistin kirine, li dijî DTP'ê û kurdan dixin nava êrîşê. Wekî 12'ê îlonê dixwaze DTP'ê û gelê kurd wekî aliyê pevçûnê bide xuyakirin. Li aliyê din dixwaze xwe li hemberî gel bike hêza jêneger. Her wiha bi vî rengî rewşa wê ji rewşa êrîşkarên faşîst ku li dora MHP'ê xwe bi rêxistin kirine talûketir e. Piştî êrîşa li dijî konvoya DTP'ê ya Îzmirê, nîqaşên hatin destpêkirin dîsa tê xuyakirin ku lîstikek bi vî rengî xistine tevgerê û ev yek nîşanên rojên berê li ber çavan radixin.

# Tirkîya wazena sinoranê xo belî biko?

EHMEDÊ BIRA

Teybeteya rayîrberdoxan a ya ke çîyanê bibê bivînê yo. Ay ra, verê qewimiyayişan bigo û vera nêdo ke şar an zi şaranê ke bi înanra girêdayeyê zirar nêvînê yo.

Dewleta Tirkîya de rayîrberdoxî gureyê xo nîyanê ca. No zî nogam û bêro de şarî keno tenganeyan mîyan. Semedê ke rayîraberdoxî ze estorê ewnîyenê xovero, heme biryarî çewt ê. Ya zî heme biryarî gora berjewendîyanê kesan ê. Rayîrberdoxanê Tirkîya şarî temsîl nêkenê. Ney ra, nêşenê şarî zî bipawê. Roj bêro odo şar çareya sereyê xo biewnê.

Cayê wina de her ke şêro odo şer û pêrodayişî bivejyê. Guniya ke dê birijyo ra hukumat û dewlet berpirsîyar ê.

Ney rojanê ke ma tedeyê ze adirî yê. Dewlet û hukumat bi adirî kay kenê. Ya zî tikeyî wazenê ke ê, bi adirî kaybikê.

Ez nûmûneyê dê kilm bidî ke, wa mijar weş bêro famkerdiş. Warê herî, her mûsnayo çuwekerdişî. Ney ra her bê çuwewerdişi rayîra nêşino. Halê Tirkîya zî eynî wina bîyo. Hetanê ke dewletê nêvajo a wina bik nêkena. No çî zaf zaf şaş o û merdişa Tirkîya bixora ano. Merdişa Tirkîya merdişa şaranê ay sero yo.

Mi verî zî vatibi, Tirkîya xo ze ortaxê Amerîkayî vînena. Zîyaretanê xo ê dewletan bi ney banî binde kena. Kişta bînî de zî qabê şîrketanê înan kar bikerê ra bezîrganeya şîrketanê xo û Amerîkayî kena. No geyrayiş qabê şarî nîyo. Kabê ke kesayeteya xo paya bidê vindertiş o.

Ney rojanê adirî de tikey kesî wazenê ke Tirkîya bibo cahenem. Cayê Serokê Kurdan Abdûllah Ocalanî 12 mîroqarê ra davistê 6 mîtroqareyî. No çî kiştişî ra avêr çîyê nîyo. Qay Tirkîyayî xo vîra kerdo, waxta ke Ocalan ardî Tirkîya se kesîra avêr merdiman xo qabê Ocalanî veşna. Wa Tirkîya heşê xo bigê xo sere û gora ney xo ta bido. Dîroka dinyayî de kesan xo qabê rêberê nêkişto. Mûameleya ke girotoxê nêweşî ra senî kenê se, wa Ocalanî ra zî keyeyê bivînê. O nêweş o. O kişta mîlyonan kesan ra Serokatey kerdo û keno. Şar ey Serokê xo qebûl kerd o. Tirkîya nêşeno ey kesî ze kesê bivîno. Tirkîya mecbûro ke hesasîyeta şarî xo çiman ra ravêro û gora înan xo ta bido.

Dîrokî de nîyameyo vînayiş ke ze şarî nêbîyo. Her dem ze şarî bîyo. Şar çiçî waşto se girewto. Belkî tikey erey girtotê ema girewtê. Wa rayîrberdoxî vîra mêkê ke, kurdî zî şar ê û waşteya înan azadîya Ocalanî û mafê kurdan o. Ney ra, avêr sînor û felan û bêvanan nêwazenê. Waştişê kurdan mafê merdiman ra avêr çîyê nîyo. Ney çîyan de kurdî mafdar ê. Feqet eyseno ke Tirkîya Serekê Kurdan eşto 'Çala Merdişî'. Yanê merdişê Ocalanî wazena. Mi verî vatibi ez taxmîn keni, merdişê Ocalanî Amerîka û mutefîkanê ey wazeno û Tirkîya zî taşeroneya înan kena. Eg no taşeroney wina şêro, no pers yeno vîran, eceba, Tirkîya wazeno kurdan ra bivisyo û sînoranê xo belî biko? Wa Tirkîya û şarê tirk bizano ke, eg plana Tirkîyayî û Amerîqayî çîyê de wina bibo se, dewletî dinyayî Tirkîya nexşeyî/harîteyî sero paqij kenê. Erdoxan û ê bînan zî ze Sultananê Osmanîyan ê peynî de bî, dê şêrê Amerîka, ya zî Êwropayî bicuyê.

Peynîya peynî de, şar mireno maneno xemê înan nîyo. Wa şarê Tirkîya vîra mêkê ke, eg şerê ke gird bivejyo se, ez bawer nêkeni ke Ataturkêna bivejyo û Tirkîya xelas bikero. Çimkî kesanê Tirkîya ê ney gamî xora xebat kenê.




Kurdî nêwazenê Sînorî bivirazê. Eyseno ke Erdogan bi waştişê Amerîkayî sînoranê xo û kurdan bivirazo. Dewra ke sînorî wedaryenê de sînor nîno qebûlkerdiş. Mafê kurdan esto ke verê ney xo bipawê

ROJEV

Zozan Basın Yayın Adına
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:** Mustafa AGGÜL

**Yönetim Yeri:** Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
**İdare Tel:** 0 (412) 251 38 88
**Yayın (Weşan)**
**Tel:** 0 (412) 237 48 91
**Fax:** 0 (412) 237 48 89
**Baskı(Çap):**
**Stenbol:** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
**Edene:** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
**Yaygın Süreli Yayındır**



Mem Mîrxan
mmirxan@hotmail.com

# Polîtîkaya rojane me nagihîne derekê

Yên ku bavê wan miriye dizanin.

Dinya bi ser serê mirov de tê xwarê.

Weke ronahiya rojê hatibe dizîn, tarîtiyek bêtarif dest pê dike.

Wek refleksa destpêkê mirov hema li çoga xwe dixe.

Piştre porê xwe kaş dike û dest bi girînê dike.

Bi dengekî bilind heta ku deng jê derdikeve diqîre.

Piştî demekê deng jî dadikeve, dike kûze kûz :

"Lo bavo! lo bavo!"

Te çima li me wa kir!

Te çima mala me xirab kir lo bavo!"

Piştî vê kûze kûzê hemû malbat weke tu mirî bî zêmara davêjin ser te: "Lo birawo! lo birawo!"

û berbe te ve tên.

Mirovên wisa bawer nakin ku wê rojekê bavê wan bimire.

Hîn dipên ku wê bavê wan ji nav nivînan rabe û here ji wan re êzingan bişikîne.

Lê mirin tiştekî wisa ye ku tu qebûl bikî jî nekî jî pêk tê.

Weke çovekî li tîtika eniya te dikeve ku tu feleka xwe şaş dikî.

Ev senaryoya yekemîn, senaryoya kesê bêtevdîr e.

Lê mirovê bitevdîr ne wisa ye.

Şert û mercên bavê wî tê de ye, gotinên doktoran bi hemû malbatê re par ve dike.

Sê roj berê diçe kefen distîne.

Hemû malbatê dicîvîne ser hev.

Ji bo wezîfeya dawiyê bi cih bîne xwe û malbata xwe amade dike.

Êdî mirin ne surprîz e, emrê Xwedê ye.

Dema bav dimire jî malbat nakeve tatêlê.

Hemû kes dibêje: "Rehma Xwedê lê be ew mir, lê kurekî weke çiya li dû xwe hişt"

Rewşa siyasetmedarên DTP'î weke kesê yekemîn e.

Bêtevdîr in.

Rojane dijîn, rojane polîtîkayê dikin.

Dema hikumetê 6 girtî şandin Îmraliyê û cihê rêzdar Ocalan hate guherandin beyî agahî û lêkolînekê bikin hew ma bû ku destmal bigirin û bilîzin.

Lê bi rastiyeke gelek hişk hîn bûn ku rewş weke dipan derneket.

Guherîn, guherîna şiklê îşkenceyê ye.

Piştî gel jî ev yek fêm kir berê xwe dan DTP'ê.

Û bû hawar hawara wan.

Berpirsiyarên partiyê jî mikrofon hildan û dest bi daxuyaniyê kirin.

Lê partiyeke ku rêberiya bi milyonan kesan dike divê hestiyar tevnegere.

Berî ku daxuyaniyek hezar kes tevlê bibe bide, divê here ba gel.

Mal bi mal bigere, fikr û ramanên gel bistîne.

Bi hemû rêxistin, komele û saziyan re li riyekê, li çareyekê bigere.

Piştî vê xebatê çalakiyek wisa pêk bîne ku qet nebe karibe dawî li îşkenceyê bîne.

Bi xebateke bi rêk û pêk, ji bo Ocalan li cihekî weke Amedê dev ji çalakiyek hezar kesî berdin, 5 hezar kes dikare xwe bişewitîne.

Lê ku mirov rojane bijî, rojane polîtika bike vê yekê nafikire, hema radihêje mikrofonê û weke kesê yekemîn heta dengê wî bikeve diqîre.

www.arsivakurdi.org

# Serî li saziyên mafên mirovan da

**Piştî Rêberê Gelê Kurd Ocalan, ji girtîgeha berê neqlî Girtîgeha Biewlehiya Bilind a Tîpa F a Îmraliyê hate kirin û odeya wî ji 12 metrekareyan daxistin 6 metrekareyan, parêzerên Ocalan serî li sazî û dezgehên mafên mirovan dan**

Parêzerên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, têkildarî şert û mercên Ocalan ên Girtîgeha Tîpa F ya Îmraliyê serî li Lijneya Şopandina Girtîgehê ya Bûrsayê, ÎHD, TÎHV, TTB, MAZLUMDER û Komîsyona Mafên Mirovan a Parlamentoyê dan. Parêzerên Ocalan ji CPT'yê jî xwest bi lezgînî hevdîtinê çêbike.

Parêzerên Ocalan, bi armanca başkirina şert û mercên Ocalan serî li Lijneya Şopandina Girtîgehê, ÎHD, TÎHV, TTB, MAZLUMDER û Komîsyona Mafên Mirovan a Parlamentoyê dan. Parêzeran bi daxwaznameyekê serî li saziyan dan û xwest mercên ocalan bêne başkirin û tecrîd bi dawî bibe. Parêzaran di daxwaznameya serlêdana saziyan de diyar kir ku muwekîlê wan Ocalan 10 sal e bi tena serê xwe di tecrîda giran de dijî û heta niha destê wî negihiştiye tu kesî. Parêzeran, anî ziman ku pêdiviyên Ocalan ên wekî pirtûk, rojname û wekî din ji aliyê dozgeriya girtîgehê ve têne dayîn û li cîhanê tu mînaka vê girtîgehê tune ne. Parêzeran, di serlêdanê de bal kişand ser cezayê hucreyan û wiha gotin: "Di sê salên dawî de bi hincetên cûda 18 caran li muwekîlê me hatiye birîn. Porê wî bêyî riza wî hatiye qusandin. Rastî gefên kuştinê hatiye û neheqiyên giran lê hatine kirin."

**Şert û merc vegotin**

Parêzeran di daxwaznameya serlêdanê de şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bi awayekî berfireh anîn ziman. Parêzeran, destnîşan kir ku muwekîlê wan girtîgeha nû wekî "çala mirinê" bi nav kiriye.

Parêzeran ku bi daxwaznameyekê serî li saziyan dan diyar kirin ku pirsgirêkên tenduristiya muwekîlê wan zêde buye û wiha gotin: "Ji sibata 1999'an û vir de ji ber di Îmraliyê di rewşa îzolasyonê de tê girtin, nerehetiyên bêhnvedanê çêbûye û kronîk bûye. Pirsgirêkên bêhnvedana wî li hucreya ku nû neqil bûye zêdetir bûye. Ji ber derdorê di bêhnvedanê tengasiyan dikişîne û ji ber vê yekê bi şevê ranakeve û neçar dimîne ji bo bêhnvedanê timî ji xew radibe. Hêza ku bêhewayî çêdike, hatiye asta fetisandinê. Bi taybetî bêhewayî bandoreke neyînî li tevahiya fonksiyana laş dike û êşên wî her roj zêdetir dike. Ev pirsgirêk di laşê wî de civandina bi şîdet tê jiyîn û muwekîlê me vê rewşê dişibîne civandinên dema dardekirinê û dide zanîn ku her roj tê darvekirin. Jiyana xwe ya di vê rewşê de dişibîne rewşek nêvî mirî, nêvî jî ji ser xwe çûyînê."

**'Ji mafên bingehîn bêpar e'**

Di daxwaznameyê de hatiye destnîşankirin ku Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji tevahî mafên xwe yên neteweyî û navneteweyî di serî de ya jiyanê û mafên bingehîn di nava rewşa heyî winda tên hesibandin û wiha vegotine: "Dewlet bi van pêkanînan ev mafên ku misoger kiribûn, winda dihesibîne. Bi polîtîkayên tunekirin û rizandinê û rewşa fîzîkî ya girtîgehê anîne asta ku lê neyê jiyîn ve dom dikin." Parêzeran, diyar kirin ku bi van pêkanînên dawiyê ku dibêjin "Başkirin" û wiha nîşanî raya giştî didin, "Li hemberî hiqûqê hîleyekê" û hişyar kirin ku rewş hind paşve birine, muwekîlê wan xistine cihekî ku tenduristiya wî xera bibe û ew terkî mirinê kirine. Parêzeran, xwestin bi lez cihê muwekîlê wan bê guherandin û rewşa ku xetereya mirinê tîne bê başkirin.

**Ji CPT'ê randevû xwest**

Her wiha parêzeran, xwestin bi lez CPT'ê ji bo rewş bê başkirin rapor amade kiribû, randevû bide. Parêzer, di nava meha kanûnê de ku di ragihandinên muwekîlê xwe de raporekê bidin CPT'ê. Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Ocalan, ji Serdozgerê Komarê yê Bursayê û Wezîrê Dadê giştînameya Îmraliyê xwestin. Parêzeran, bilêv kir ku giştînameya ku divê li tevahiya girtîgehan be, lazim e ji bo Girtîgeha Îmraliyê jî derbas bibe û xwestin giştînameya ku mafên mewekîlê wî tê de ne û rewşa fîzîkî ya girtîgehê bidin wan. STENBOL



## 'Divê CPT biçe Îmraliyê'

*PARÊZERÊ* Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Omer Guneş beşdarî bernameyeke ROJ TV'ê bû û pêkanînên li hemberî Ocalan wekî darbeyeke siyasî bi nav kirin. Guneş ji Lijneya Pêşîlêgirtina li Îşkenceyê (CPT) xwest ku heyetekê bişîne Îmraliyê.

Parêzerê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, Omer Guneş got ku dewleta tirk li ser navê sererastkirina şert û mercên Îmraliyê, tecrîd girantir kiriye û wiha got: "Avahiyeke nû avakirin. Ocalan neqilkirin hucreyeke 6 metrekareyî. Ligel ku birêz Ocalan nerazîbûna xwe aniye ziman, dîsa jî şert û merc nehatine başkirin. Ji ber hindê ye ku birêz Ocalan ew der wekî wekî 'Çala Mirinê' navkiriye."

**'Ceza siyasî ye'**

Guneş anî ziman ku pêkanînên li hemberî Ocalan darbeyeke siyasî ye û wiha pê de çû: "Cezayên siyasî ne li gorî mafên mirovan e. Otorîteyên siyasî li gorî xwestekên xwe pêk tînin. Birêz Ocalan dîlgirtiyekî siyasî ye. Lê ne li gorî hiqûqa mafên mirovan û pîvanên wijdanê ceza nadinê."

Parêzer Guneş yek bi yek şert û mercên Îmarileyê vegotin û bi bîr xist ku Îmralî girêdayî Maseya Krîzê ya Serokwezîrtiyê ye. Guneş got ku girtîgeha Îmraliyê li gorî standartên girtîgehên Tîpa F nehatiye çêkirin.

**'CPT agahdar e'**

Guneş di bernameya televîzyonê de bal kişand ser berpirsiyariya CPT'ê û diyar kir ku ew her meh rapora xwe pêşkêşî CPT'ê dikin û anî ziman ku binpêkirinên mafên Ocalan ên li Îmraliyê radigehînin. Lê CPT nakeve nava liv û tevgerê. Guneş xwest ku CPT'î demildest biçe Îmraliyê û wiha got: "Me agahdarî kiriye. Agahiya vê saziyên ji pêkanînên du hefteyên dawî jî heye. Divê demildest heyetek biçe Îmraliyê. Pergal berovajî raporên Îmraliyê hatiye sazkirin. Li vir 2 noqteyên girîng hene; ya ewilê dewletê bawerî da CPT'ê ku dê şert û mercan sererast bike. CPT ji destpêkê hate niha di nava vê meseleyê de ye. Çi çêbibe agahiya wan jê heye. Ji pêkanîn û çêkirina avahiyê nû agahdar e. Û peywîra xwe bi cih neanî ye. Heke dibêje 'me berpirsiyariya xwe bi cih aniye' divê demildest daxuyaniyekê bide û heyetekê bişîne Îmraliyê."

**'Darbeya siyasî ye'**

Guneş pêkanîn li hemberî Ocalan wekî darbeyeke siyasî nav kirin û anî ziman ku hikûmet bi israr dixwaze Ocalan derveyî pêvajoyê bihêle. Guneş wiha got: "Ev darbeyeke siyasî û hiqûqî ye. Di vê pêvajoyê de pêşketina van pêkanînan darbeyeke siyasî ye." BRUKSEL

## Çalakî berz bûn

Li Geverê girseyek mezin bi armanca şermezarkirina şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ên girtîgehê meş li dar xist. Li ser mudaxeleya polîsan li navçeyê pevçûnan dest pê kir. Çalakiyên ciwanan li bajarên Tirkiyeyê zêde bûn.

Li navçeyên Gever û Şemzînanê yên Colemêrgê esnafan bi armanca şermezarkirina şert û mercên Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ên girtîgehê dikan venekirin. Li navçeyên tevahiya dikanan hatin girtin, polîs û leşkeran tedbîrên berfireh girtin. Girseyek mezin bi armanca şermearkirina tecrîdê li taxên Geverê berhev bû û ber bi navenda navçeyê ve dest bi meşê kirin. Koma ji bo Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan slogan avêtin rastî mudahale polîsan hat. Polîsên bi bombeyên gazê û ava şidayî mudahaleyî girseyê kir, rastî bersiva bi molotofkokteylî û keviran hat. Li navçeya nişkave vegeriya qada pevçûnê, gengaşî didome. Her wiha polîsan gelek kesên li taxan û navenda navçeyê digerin jî girtin bin çavan.

Ji bilî Geverê li Mêrsîn, Antalya, Stenbol, Colemêrg û Amedê jî çalakiyên bi mebesta şermezarkirina tecrîda li hemberî Rêberê Gelê Kurd Ocalan hatin lidarxistin. Ciwanan bi molotofan êrîşî polîsan kir û gelek wargehên dewletê wêrankirin. COLEMÊRG

## Tecrîd nîşaneya samîmiyetê ye

Parlamentera DTP'ê ya Wan Fatma Kurtulan, diyar kir ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan xistine gorek 6 metre û wiha got: "Behsa aştiyê dikin lê her roj zext û işkenceyê zêde dikin. Tu gavên çareseriyê navêjin, hej jî cenazeyên gerîllayan tên. Tecrîda li ser Ocalan ya dawî helwesta hikumetê ya aştiyê û semîmiyeta wan diyar dike."

Li Wanê bi boneya 32'emîn salavegera damezirandian PKK'ê li Salona Dewatê ya Erenogluyê şahiyek hate lidarxistin. Di şahiyê de malbatên zarokên xwe di pevçûnan de windakirine, Parlamentera DTP'ê ya Wanê Fatma Kurtulan, rêveberên DTP'ê yên bajar, Meclîsa Aştiyê, endamên DOKH, YDG û Însiyatifa Dayikên Aştiyê jî di nav de bi hezar kes beşdari bûn. Di şahiyê de Alîkarê Serokê DTP'a Wanê Îsmaîl Demîr, diyar kir ku 32 sal berê yekemîn gava azadbûna gelê kurd hate avêtin û wiha got: "30 sal berê yekemîn gava azadiya gelê kurd ji aliyê 22 kesan ve hate avêtin. Ev tevger ji 22 kesan gihişte mîlyonan. Têkoşîna wan ya bi rûmet daye dest pê kirin, îro jî birumet didome. Vîna PKK'ê afirandî, bi salane li hemberî, îşkencê, zilmê û zextan xwe li ser piyan digire."

**'Tecrîd nayê qebûlkirin'**

Endamê Meclîsa Aştiyê Mehmet Şîrîn Tunç jî diyar kir ku dewleta tirk di "Serildana Agiriyê" de gora gelê kurd koland û li ser riha gelê kurd fatiha xwend, lê tevgera PKK'ê ev yeke qebul nekir û gelê kurd bi vînekî azad careke din bi ruh kir. Tunç ji dîroka PKK'ê hinek dem jî vegotin û wiha got: "Îro tecrîda li ser Birêz Abdullah Ocalan tê meşandin ji bo ku wî tûnebikin e. Gelê kurd vê yekê qebul nake û dê demekî kin de bertekên xwe nîşan bidin."

**Gora 6 metrekareyî...**

Di şahiyê de Parlamentera DTP'ê ya Wanê Fatma Kurtulan jî diyar kir ku daxwaz û evîndariya wan a aştiyê gelek mezin e. Kurtulan, ani ziman ku di dema ku komên aştiyê hatine Tirkiyeyê coşa li Silopiyê hatiye nişandan hînek derdoran bi şaşî nîrxandin. Kurtulan bal kişan de ser êrîşa Îzmîrê û wiha axivî: "Li hemberî vê çoş li Îzmîrê faşîstan provokasyon pêk anîn û peyama 'Hûn li Silopiyê keyfxweşiyê bikin em dê li Îzmîrê serê we bişkînin' dan. Ez li vir jî wan dipirsim hûn di nav bera zarokên xwe de cudatiyê dikin an ne. Kesên ji Qandîl û Mexmurê hatin zarokên gelê kurd in. Gel ew hemberî kirin." Kurtulan, destnîşan kir ku Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan xistine gorek 6 metreyî û wiha domand: "Dixwazin gelê kurd winda bikin. Behsa aştiyê dikin lê zext û işkenceyê pêk tînin. Tû gavên çareseriyê tûnene her roj cenazeyên gerîllayan tên. Tecrîda dawî ya li ser Ocalan helwesta hikumetê ya aştiyê û samîmiyeta wan derdixe holê. Dixwazin listikekê bilizîn. Bi vê listikê dixwazin PKK'ê tasfiye bikin û ji gelê kurd veqetînin." Axiftina Kurtulan gelek caran bi diruşmeyên "Tecrîd sedema şer e", "Bijî serok Apo " hate birîn. Endamê YDG'ê Şahîn Şanci jî axiftinek kir û bal kişan de ser rewşa tenduristiya Ocalan û xwest ciwanê kurd vê yekê qebul nakin. Piştî axiftina sînevîzyona damezirandina PKK'ê vedigot hate temaşekirin û piştre jî hunermendê NÇM'ê konserek dan û bi dawî bû. WAN

## Polîsan li Bazîdê talîmata Erdogan pêk anî

Girseya ku li navçeya Bazidê ya Agiriyê, beşdarî pêşwazîkirina Komên Çaresariya Demokratîk û Aştiyê bûn rastî mudaxaleya polîsan hat. Erdogan piştî gera DTP'ê ya Îzmîrê DTP û komên aştiyê kiribûn hedef.

Endamên Komên Aştiyê ku bi banga Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji Qendîl û Maxmûrê hatibûn Tirkiyeyê ji Wanê derbasî navçeya Bazidê bûn. Ji endamên komê Gulbahar Çîçekçî, Nizar Buldan, Nurettîn Turgut û endamê Koma Aşîtiye yên yekem Şîrîn Tunç, li ber avahiya DTP'a Bazidê ji aliyê hezaran kesî ve hatin pêşwazîkirin. Piştî pêşwazîkirinê, di navbera polîsan û girseyê de pevçûn derket. Li ser mezinbûna nîqaşan polîsan bi bombeyên gazê mudaheleyî girseyê kir. Piştî pevçûnên di nav bera endamên komê xîtabî gel kir.

Li navçeya Geverê ya Colemêrgê, girseya ku bi armanca şermezarkirina rewşa Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan a li Îmraliyê, meş li dar xist, rastî mudexaleya polîsan hatin. Komên ku piştî mudexaleya polîsan a bi ava şîd û bombeyên gazê, li taxên cuda yên navçeyê hatin cem hev, dîsa berbi navenda navçeyê ve meşiyan.

Tê zanîn ku Erdogan piştî gera DTP'ê ya jî Îzmîrê dabû destpêkirin û rastî êrîşa nijadperestan hatibû, DTP û komên aştiyê wekî hedef nîşan dabûn. Erdogan anî bû ziman ku ew ê destûrê nedin ku gel li hemberî wan şanasiya xwe bîne ziman. AGIRÎ - COLEMÊRG

www.arsivakurd.org

# YE bû şirîkê Dîcle û Firatê

## Tirkiyeyê di muzakereyên ji bo endamtiyê de bê ku ji kurdan bipirse û destûra kurdan bigire ji bo kontrolkirina rûbarên kurdan ên Dîcle û Fratê Yekitiya Ewropayê jî kir hevpar




Hat hînbûn ku Tirkiye, di çarçoveya muzakereyên endamtiya Yekîtiya Ewropayê (YE) de di bin navê 'hawirdorê' de yekîtî û rêveberiya hevpar pejirand. Li gorî vê Tirkiye qebûl dike ku YE di kontrola rûbarên Dîcle û Firata kurdan hevpariya Tirkiyeyê bike.

Tirkiye û YE, der barê 'hawirdorê' de ya ku dê di sercivîna YE'yê ya 10 û 11'ê kanûnê de pêk bê, bi hev kirine. Li gorî vê peymanê, mafê YE'yê diafire ku bikaribe mudaxeleyê parvekariya ava rûbarên Dîcle û Firatê bike.

**Polîtîka avê ya Tirkiyeyê**

Komîsyona Ewropayê di rapora xwe ya 2004'an de xwestibû ku heke Tirkiye bibe endam divê kontrola rûbarên Dîcle û Firatê, bendavên ku li ser bên çêkirin û plansaziyên avdanê ji YE'yê re bihêle û di vî warî de bi Israîlê re jî hevkariyê bike. Di nav Tirkiye û Israîlê de li pişt dîwaran her diçe hevkariya li ser av û axê zêde dibe. Ev jî nîşan dide ku li ser axa ava kurdan bê ku destûra kurdan hebe bazarên qirêj tên kirin.

Parlamentoya Ewropayê di 15'ê kanûna 2004'an de polîtîkayên Tirkiyeyê yên avê rexne kiribû û wiha gotibû: "Divê ku Tirkiye di derbarê pêdiviya avê ya welatên cîranên xwe de baldar be. Bi taybetî jî piştî Bendava Ataturk ava ku diçe Îran û Iraqê gelek kêm bûye. Pêwîst e ku Tirkiye hin rûbarên xwe yên sereke bi cîranên xwe re parve bike." **BRUKSEL**

# Obama biryara xwe aşkera dike



**Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama diyar kir ku stratejiya xwe ya ji bo Afganistanê diyar kiriye û ji bo diyarkirinê amadekariyê dike. Li Afganistanê bi giştî 68 hezar leşkerê biyanî di kontrola NATO'yê de li dij Talîban û El Qaîdeyê şer dike.**

**Tê payîn ku Obama di aşkerakirina biryara xwe de bêje Amerîka bi kêmanî 30 hezar leşker dişîne Afganistanê.**

**Barack Obama ji bo amadekariya stratejiya xwe ya Afganistanê 3 meh e ku dixebite. Hat aşkerakirin ku Obama staratejiya ku hatiye diyarkirin dê di axaftina xwe ya Akademiya New York West Pointê aşkera bike.**

**Di rewşa heyî de li Afganistanê 68 hezar leşkerên Amerîkayê hene û bi giştî 100 hezar leşkerên biyanî hene.**

**Li gor agahiyên ku hatin bidestxistin Obama di axaftina xwe de hem li ser sedemê dagirkirina Afganistanê û hem jî dê kengê li Afganistanê şer raweste jî vebêje. Berdevkê Qesra Spî jî aşkera kir ku Obama beriya ku stratejiya xwe aşkera bike ligel lîderên mutefîk ên Rojava li lîderê Çîn û Rûsyayê geriyaye û der barê mijarê de agahî daye wan.**

**'NATO 10 hezar leşker dişîne'**

**Serokwezîrê Îngilistanê Brown di daxuyaniya xwe de diyar kir ku dê Îngilistan 500 leşkerên din bişîne Afganistanê. Hat gotin ku dê Îngilistan ligel hêzên xwe yên taybet hejmara leşkerên xwe yên Afganistanê derxe ser 10 hezarî.**

**Berdevkê Qesra Spî Robert Gibbs jî di daxuyaniya xwe de diyar kir ku Obama dema agahî daye lîderan diyar kiriye ku tehdîda li Afganistanê her kesî tehdît dike û ji ber vê jî ji wan xwestiye tedbîr jî bi giştî bê girtin.**

**Rayedarên Wezaretên Parastina NATO'yê jî diyar kirin ku hêvî heye ku welatên endam ên NATO'yê jî 10 hezar leşkerî bişînin. Di vê çarçoveyê de dê 40 hezar leşkerên nû yên biyanî biçin Afganistanê.**

**Li Afganistanê şer giran dibe. Talîban kontrola xwe berfireh dike. Derbeyên mezin li hêzên biyanî yên NATO'yê dide. Ev jî fikara têkçûna NATO'yê zêde dike.** *WASHINGTON*

# Li Îskoçyayê referanduma azadiyê

Hikûmeta Îskoçyayê hewl dide ku li ser azadiya xwe referandûmê li dar bixe û ji Hikûmeta Qralyeta Hevgirtî ya Îngilistanê veqete.

Serokê Patiya Neteweyiya Îskoçyayê û Serokê Hikûmeta Xweser a Îskoçyayê Alex Salmond li ser mijarê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de got ku dema diyarkirina azadiya îskoçan hatiye.

Serokwezîrê Îskoçyayê Alex Salmond destnîşan kir ku bi taybetî azadiya der barê aborî û karên derve de giring e. Salmond da zanîn ku ew ê têkiliyên xwe yên bi Qralyeta Hevgirtî re xurt bigirin. Salmond wek mînak jî çarçoveya azariya Îskoçyayê wiha diyar kir: "Em ê Keybanûya Hikûmeta Qralyetên Hevgirtî wek serokdewletê xwe qebûl bikin lê ji bilî vê em jî dê wek welatekî Ewropayê xweser bin.

Salmond vedibêje ku ew jî dixwazin bibin xwediyê butçeya xwe, aboriya xwe birêve bibin û di platformên din ên Yekîtiya Ewropayê de wek welatên din nûnertiya gelên xwe bikin. Balkêş e ku her diçe ev daxwaz di nav îskoçan de xurt dibe. Heke li Îskoçyayê ji bo azadiyê referandûm çêbe û îskoçî azadiya xwe destnîşan bikin, ne pêkan e ku Îngilistan li dijî vê dest bi zorê bike. **LONDON**



Alex Salmond

# Îranê 5 îngilîz binçav kirin

Hikûmeta Îngilistanê aşkera kir ku 5 welatiyên wan bi xeletî ketine qada Îranê û ji aliyê hêzên Îranê ve hatine binçavkirin. Li ser mijarê Wezareta Karên Derve ya Îngilistanê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de hat gotin ku 5 welatiyên îngilîz dema ji Bahreynê diçûn Dubaiyê bi xeletî derbasî nav qada deryayî ya Îranê bûne. Ji ber vê jî hatine binçavkirin. Hat gotin ku îngilîzên mijarê gotinê bi lezbotê diçûn û di wê leziyê de riya xwe şaş kirine.

Bûyer roja 25'ê mijdarê pêk hat û li ser mijarê sefîrê îngilîz ê Tehranê bi rayedarên Îranê re hevdîtin kiriye û xwestiye welatiyên wan serbest bêne berdan.

Di demên borî de jî 15 leşkerên Îngilîstanê bi hinceta ku qada deryayî ya Îranê binpê kiribû hatibûn binçavkirin û piştî du hefte girtî serbest hatibû berdan. Ji ber vê bûyerê di sala 2007'an de di nav Îran û Îngilistanê de alozî kûr bû.

Hikûmeta Tehranê 3 welatên Amerîkayê jî bi sedema ku bê destûr ketine nav sînorên Îranê di girtîgehê de tên girtin. Der barê wan de ji ber casûsiyê doz hatiye vekirin. **LONDON**

# Haaretz: YE dewleta Filistînê ya serbixwe dinase

Rojnameya Haaretz a Israîlê diyar kir ku dê hefteya pêş wezîrên karên derve yên Yekîtiya Ewropayê bicivin û di civînê de dewleta Filistînê ya ku Qudsa Rojhilat paytexta wê ye dê nas bikin.




Haaretz destnîşan dike ku wan belgeyek bi dest xistine û belge di dema serokatiya demî ya Swêdê de hatiye amadekirin. Rojname vedibêje ku Wezîrên Karên Derve dê bang hem li Filistînê û hem jî li Israîlê bike û dewleta Filistînê qebûl bike. Qudsê jî wek paytexta her du welatan destnîşan bike.

Wezîrên Karên Derve yên Yekîtiya Ewropayê roja 7'ê kanûnê dê li Brukselê bicivin. Di vê civînê de mijar û rojek pêvajoya Israîl-Filistînê ye. Civîn du roj dom dike. Di encama civînê de li ser polîtîkayên Rojhilata Navîn dê daxuyanî bê dayin.

Ji vir hefteyek berê Berdevkê Hikûmeta Filistînê jî diyar kiribû ku dê hikûmeta Ramallah dewleteke xweser a filistîniyan îlan bike û ji Neteweyên Yekbûyî (NY) bixwaze ku dewleta ku Qudsa Rojhilat paytexta wê ye û di nav sînorê 67'an de serbixwe hatiye damezrandin nas bike. **TEL AVÎV**



**Feleknas Uca**

feleknasuca@web.de

## Êzîdiyên Ermenistanê -II-

Min di nivîsa xwe ya dawiyê de li ser êzîdiyên Ermenîstanê nivîsandîbû.

Ev ne çûyîna min a yekem bû. Pirsgirêkên êzîdiyên Ermenistanê her diçin zêde dibin. Çareseriya pirsgirêkan nayê dîtin û pirsgirêkên din dikevin ser yên kevin.

Dîroka êzîdiyên Ermanistanê kevn e.

Di dema xwe de, ji ber zext û tadeyan êzîdiyan xwestiye ku ji xwe re cihê starê û welatekî tê de azad bijîn bibînin. Demên dûr û dirêj derbas bûne lê êzîdî bi rûh û ramana xwe girêdayê eslê xwe mane. Piraniya wan dixwazin vegerin axa bav û kalên xwe. Ew dixwazin vegerin cihê ku tê de nasname, çand û ola azad bijîn.

Ji wan kesên li gundan dijîn hînî jiyana derdora xwe bûne.

Lê divê nayê jibîrkirin ku polîtîkaya asîmîlasyonê li hemberî wan tê meşandin.

Tê gotin ku êzdî ne kurd in û kurd li dij êzîdiyan komkujiyan pêk tînin.

Ev polîtîka bûye sedem ku yekitiya êzîdiyan ketiye nav xeterê û beşek ji êzîdiyan li hemberî netewa wan dikişînin nav lîstikan.

Ji ber ku di herêma ku êzîdî tê de dijîn, neçarî serdest e û ev herêm ji aliyê aborî ve paşdemayî ne derfeta meşandina lîstikên li ser êzîdiyan zêdetir dibe.

Hêj jî di hinek malan de av tune ye. Di demên sar de malbat xwediyê hacetên germkirinê nîn in.

Bêkarî zêde ye. Kes nikare kar bibîne û her diçe ciwan bajar û gundên xwe diterikînin.

Kêmhejmarek ciwanên ku diçin dixwazin biçin zanîngehê. Piraniya wan jî dixwazin biçin Ewropayê û bibin penaber.

Beşeke wan jî li Gurcistanê an li Rûsyayê bûne koçber.

Tiştê balkêş: Malbat, bi dîtina min zêdetirîn bav keçên xwe yên 14 salî an jî 15-16 salî didin mêr.

Beşên ji êzîdiyan olê êzîdîtiyê berdidin û derbasî baweriya 'Yahova' dibin.

Ji ber kêmbûna agahdariyan û naskirina ola êzdayatiyê ev kes ola xwe ji nêzîk ve nas nakin û ji wan re tê gotin ku, kesê ku bibe endamê baweriya 'Yahova'yê, xwedê rast nas dike. Ji ber vê jî kesên nezan riya xwe diguherin. Wek tê gotin, ji bo kesên ku amade bin olê xwe biguherin pere tên dayîn.

Di salên dawiyê de hejmara kesên ku ola êzdayetiyê berdidin, her diçe zêde dibe.

Ji ber wê yekê jî rexne li rêxistina êzîdiyan li Ewropayê, bi taybetî jî li Almanyayê, li Federasyona Komelên Kurdan bilind dibe: Çima ji bo êzîdiyên Ermenistanê zêde gav nayên avetin?

Êzîdiyên Ermenistanê xwe tenê dibînin; kes ji bo berjewendiyên êzîdiyên Ermenistanê pêçiya xwe nalivîne;

Êzdî gelê sêwiyê Qafkasyayê ne;

Kes behsê wan nake;

Kes alîkariya wan nake.

Ez dikarim di dawiyê de bêjim: Heger kes ji bo êzîdiyên Ermenistanê gavan neavêje dê di demeke nêzîk de tenê kêmhêjmarek êzdî bi olê xwe bijîn.

Biryar ya êzîdiyên Ermenistanê ye;

Biryar ya êzîdiyên Ewropayê û biryar ya êzdiyên ku li Iraqê dijîn e.

# ‘Dozgerî ew terkî mirinê kir’

**Siddika Platîn, li navçeya Saraya Wanê dijî ji aliyê hevserê xwe ve rastî îşkenceya hovane hat. Platîn serî li dozgeriyê da, lê dozgeriyê ew wekî neheq dît û dîsa şand cem hevserê wê**

Li navçeya Saraya Wanê jina bi navê Siddika Platîn ku ji aliyê hevserê xwe ve rastî şîdetê hatibû ji aliyê SHÇEK’ê dihat parastin. Lê Siddika Platîn bi biryara dozgeriyê dîsa şandin malê. Li ser vê biryarê komeleyên jinan ev rewş protesto kir.

Li navçeya Saraya Wanê li gundê Heretîl di 25’ê îlonê de jina bi navê Siddika Platîn ji aliyê hevserê xwe rastî îşkenceya fîzîkî hat. Platîn li ser vê serî li dozgeriyê da û hevserê xwe gilî kir. Siddika Platîn ji ber vê bûyerê ji aliyê SHÇEK’ê ve hatibû parastin. Dozgeriyê biryareke balkêş da û jina ku ji aliyê hevserê xwe ve rastî îşkenceyê hatibû, careke din şandin cem hevserê wê.

Komeleya Jinan a Saray, YAKA-KOOP, Komeleya Jinan a Mavîgol û endamên Komeleya Jinan a Wanê li Edliya Wanê hatin cem hev. Ligel van bavê Platîn Ado Ozer û birayê wê Ramazan Ozer jî li wir amade bûn.

Li ser navê jinan nûnera Komeleya Jinan a Mavîgol Saîme Surme axivî û wiha got: “Kesê bi navê Faruk Platîn li hevsera xwe îşkence kiriye. Li şûna ku bihata girtin serbest hate berdan. Her wiha Siddika Platîn jî di bi parastina SHÇHK’ê de bû. Ew jî bi biryara dozger careke din şandin cem hevserê wê. Yanî Siddika Platîn bi awayekî zanebûn şandin nava şîdetê.”

**‘Mêr serbest digere’**

Surme di berdewamiya daxuyaniyê de wiha got: “Divê biryar demildest bê xerakirin û Platîn dîsa bê parastin. Berpirsê bûyerên serbest digere. Ev yek nayê qebilkirin. Faruk Platîn niha serbest li kolanan digere. Dozger dema ku Siddika Platîn teslîmê hevserê wê kiriye, malbata Siddika Ozer jî hişyar kiriye. Dozger gazî malbata Siddika Platîn dike û dibêje ku eger ku hûn zirarê bidin Faruk Platîn em ê we berpirsiyar bibînin. Lê niha em nizanin ka Siddika Platîn di çi rewşê de ye. Belkî niha îşkence lê tê kirin. Rewşa wê tu kes nizane. Li şûna ku hevserê wê bihata girtin niha, ew terkî şîdetê kirin. Siddika ji ber polîtîkayên dewletê niha bi mirinê re rû bi rû ye. Careke din hevserê wê dikare bikuje jî. Bi dehan car rastî îşkencê hatiye. Birîndar bûye. Siddika terkî îşkenceyê kiriye.”

**'Berpirsiyar dewlet e'**

Surme bal kişand rewşa Siddika Platîn û diyar kir ku ew ji rewşa wê bi fikarin û wiha pê de çû:

“Em ji rewşa wê bi fikar in. Dewlet berpirsiyariya xwe nayne cih. Yanî jinê terkî mirinê dikin. Mixabin SHÇEK jî peywira xwe nayne cih. Rêbazên şaş dikin.” WAN / DÎHA




# Li dijî şîdetê xebateke hevpar

Di 28’ê îlonê raporeke der barê şîdeta li hemberî jinan hate aşkerakirin. Li gorî raporê li Kenyayê hejmara jinên ku tecawiz û tacizê re rû bi rû mane zêde bûne. Gelek caran bi zora çekan jin bi tecawizê re rû bi rû dimîne. Gelek jin piştî van bûyeran jiyana xwe ji dest daye.

Li gorî rapora ku hatibû aşkerakirin hejmara şîdeta li hemberî jinê her diçe zêde dibe. 10 sal in leşkerên Komara Kongo ya Demokratîk, şîdet û tecawizê wekî çek li hemberî jinê bi kar tînin. Her wiha welatên ku şer heyî de ev nakokî bêtir derdikevin holê. Keç û jin di hemû şeran de bûne mexdûr. Zewaca bi zorê, zewaca bi temenê biçûk, leşfirojî û kuştina bi hinceta namûsê hwd rewşa jiyana jinê tîne ber çavan.

Li başûrê Kurdistanê û Iraqê hejmara kuştina bi hinceta namûsê gelek zêde ye. Her wiha ev kuştin di nav civakê de kuştineke asayî tê dîtin. Li gorî çavdêrên civaka sivîl, li herêmê sinetkirina zarokên keç her diçe zêde dibe. Li gorî îstatîstîk û agahiyên fermî di bûyeran de herî zêde jin dibin qurban û mexdûr.

Di raporê de hate destnîşankirin ku li hemû cîhanê jin rastî êrişên dijwar tên. Ji bo pirsgirêk ji holê rabe divê bi tevahî sazî û dezgeh ser cezakirina wan sûcan xebateke giştî pêk bîne. Ji bo wekheviya jinan jî divê xebatên taybet ên rêxistinbûnê bên avakirin.

Di raporê de hate gotin ku şîdeta li hemberî jinê ne tenê pirsgirêka jinê ye. Ev azmûneke û divê cîhan hemû li ser ve mijarê bisekine. Wekî pirsgirêkeke navneteweyî bê dîtin û wisa bê çareserkirin. Ji bo çareseriyê divê teqez qanûn bên sererastkirin. Li hemberî sûcên şîdet û kuştina bi hinceta namûsê cezayên giran bê dayîn. Her wiha divê oldar jî tevlî xebatên li dijî şîdeta li hemberî jinê bibin û li gorî wê sozên xwe bidin. Dîsa di raporê de hate destnîşankirin ku ji bo têkoşîna li hemberî şîdeta ser jinê divê gel û bi taybetî keç û xort bêne perwerdekirin.

Wezîra Derve ya Amerîkayê, Hillary Clinton ev mijar kiriye armanca sereke ya polîtîkaya derve ya Amerîkayê. Hikûmeta Obama jî rijde li ser jiholêrakirina şîdeta li hemberî jinan li Amerîka xebatên berfireh bidin despêkirin.

Her wiha hikûmeta Kurdistanê jî li dijî şîdeta li hemberî jinê hîn gav avetine. Di sala 2008’an de Komîteya Şîdeta li Hemberî Jinan a Hikûmeta Herêma Kurdistanê li dijî şîdeta xebatan dimeşîne. Ji bo guherandina qanûnan xebatan dike. HEWLÊR

# Sinetkirina jinan hate qedexekirin

Holandayê jî, Fransa ji bo xwe mînak girt û sineta jinan qedexe kir. Fransa bi salan e li dijî sinetê têdikoşe.

Holandayê di salên dawiyê de têkoşîna xwe ya li hemberî sineta jinan berfireh kir û bi qanûnan sinetkirina jinan qedexe kir.

Ji bo welatiyên Holandayê yên bi eslê xwe ji welatên ku sinetkirina keçan lê dibe girêbestek hate amadekirin. Dê û bav berî herin welatê xwe, divê vê girêbestê imze bikin û misoger bikin ku keçên wan sinet nebe.

Wekî tê zanîn li Holandayê sinetkirina keçan bi zagonên giştî gedexe ye.

Li gorî benda 300 - 304 ji yaseya sizayê êşandin û birînkirin cizabar e û li ser wê bingehê tawankarên sunetkirina keçan tên cezakirin. Bi wê qedexeyê tê armanckirin ku sinetkirina jinan li hemû cîhanê bê qedexekirin. Ji ber ku gelek zarokên keç ji ber sinetê pirsgirêkên dijwar re rû bi rû dimînin. Avesta

# Dengê Zeynep Celaliyan bibihîzin!

Komjinê bi armanca ku piştgiriyê bidin Zeynep Celaliyan daxuyaniyek dan û bang li hemû rêxistinên navneteweyî kirin. Komjinê di berdewahiya daxuyaniya xwe wiha dibêje:

“Zilm, zordarî û tund û tijiya dewletên kolonyalîst ya li ser gelê kurd bûye karê rojane. Zeyneb Celaliyan di vî warî de mînaka dawîn e. Rejîma Îranê ya kevneperest û hovane cezaya darvekirinê da Zeyneb Celaliyan. Zeyneb, di roja 14.01.2009´an de derket ber Dadgeha Şoreşê, bê parêzer, di nav 7 deqîqeyan de hat dadgehkirin. Ceza îdamê girt û ev ceza ji aliyê Dadgeha Bilind ya Îranê ve hat pejirandin.’

**Daxwaza dawî**

Komjin li ser daxwaza dawî ya Celaliyan sekinî û wiha got: “Daxwaza wê ya dawî ev e ku beriya darvekirinê malbat û dayika xwe bibîne û ji wan xatir bixwaze. Ji aliyê dadgeran ve ev daxwaz hate redkirin. Li çar aliyê cîhanê, daxwaza mehkûmên îdamî ya dawîn bi cih tînin. Lê mixabin ev ji bo kurdan nayê bicihanîn. Niha kes guh nade daxwaza jina kurd li ber darvekirinê ye. Lê, helwesteke bi vî awayî ya ji mirovahiyê û ji dadiyê dûrtir neyê qebûlkirin. Ne tenê Zeyneb di zîndanên Îranê de gelek kurd li ber darvekirinê ne. Nêzî 15 welatparêzên kurd li benda îdamê ne. Zeyneb û girtiyên din yên di bin zilm û zordariyên giran jiyana xwe didomînin, li hember vî neheqiyê, ji parêzêrên mafên mirovan daxwaza pişgirî û alîkariyê dikin.’ Em wek jinên KOMJINî, vê helwestê wek hestiyarî û berpirsiyariyek civakî dibînin û bang li Rêxistina Miletên Yekbûyî, Yekîtiya Ewropayê, dewlet û hukûmetên Rojavayî û parêzerên mafên mirovan dikin, ku zext li ser rejîma kevneperest ya Îranê bikin û ji wan, ji bo Zeyneb Celaliyan û girtiyên din daxwaza alîkarî û pişgiriyê dikin. TEHRAN

## DÎLAN CÛDÎ

### Xewn û xeyalê min…

Çawa ku di xeyalên her gerîlayekî de dîtina rêbertiyê heye, min jî tim xeyal dikir ku ez rojekê rêberê xwe bibînim. Rêbertî her tim mevanê xeyalê min bû. Ev xeyal temenê min yê nav têkoşînê de, di sala 1989’an heya sala 1996’an de her tim hebû. Piştî demeke dirêj mayina xwe ya herêma Botanê ez çûm herêma Zapê. Dema ku ez li Zapê bûm, her tim bi xeyalê xwe re ez diçûm Botana rengîn. Ez li wan çiyayên ku min zaroktiya xwe tê de derbas kiribû digeriyam. Ji wir derbasî mêrg û kaniyên Feraşînê bûm. Carîna min ser zinaren aseyên Herekolê qîr dikir.

Şevek ji şevan ez gelek westiyabûm. Min gelek êş dikişand. Êşa me ya hevaltiya bê dawî bû. Ya windakirina heval Bêrîvan û heval Fehîma bû. Xeyalê van her du hevalan ji dîtina rojê bû.

Her du hevalan amadekariyên xwe yên çûyina qada rêbertiyê dikirin, di encama êrîşa dijmin de her du hevalan jiyana xwe ji dest dan. Şehadeta her du hevalan bi rastî jî bandorek gelek mezin li ser hemû hevalan bi taybet jî li ser min kiribû. Ji ber xwestek, xeyal û armanca wan hemû xwe gîhandina qada rêbertî û naskirina rêbertiyê bû. Ev xwestekên wan dê pêk bihata. Ji ber vê yekê gelek kêfxweş bûn. Şehadeta wan a wê demê merteba herî mezin bû. Hesreta wan ya herî mezin dîtina rêbertî bû. Lê wekî gelek hevalan bi vê hesretê şehîd ketin.

Êvar bû… Me agirê xwe pêxistibû. Bê guman gerîlayek bê agir nayê fikirandin. Agir sebr û hiznê dide mirovan. Dema ku gerîla li derdora agir rûdinên û di destê van de qedehên çayê û ji demjimêrê bê agahî dikevin nav biranînan… Her tim gerîlayê li ber agir, bi xeyalên germ û bi şewat bi rêberê xwe re dikirin yek.

Agir ji bo gerîlayan hem kêfxweşiyê û hem xemgîniye. Hemû xwesteka di nav pêt û alavên xwe de dide xemilandin û datîne pêşberî me. Carîna ew dibe Bêrîvan, carîna dibe Fehîma, carîna dibe Zîlan carîna dibe Bermal, carîna dibe Rotînda, carîna dibe Zeyneb, carîna dibe Meryem…

Di rastî de ev ne hêza agir bi xwe ye. Ev heza qehremanî û hestên mirovan a ku bi agir bûne di nav wan pêtan de xwe didin diyar kirin, her çiqas ew heval ne di nav me de jî bin. Piştî van xeyala min ji hevala destûr xwest. Û bi şevbaşê re ez çûm manga xwe. Min serê xwe danî ser balîfa xwe. Wekî tê zanîn balifa gerîla çentê wan ne. Bi danîna serê xwe re min berê xwe da asîmanê sitêrka. Min ferq kir di wê şevê de stêrk jî dixwazin bi axifin. Çend gotina ji min re bêjin.

Mêvanê xewnên min hatibû. Tam di wê demê de hevalekê hat ez şiyar kirim û got ‘heval ti nobedarî’. Ez gelek hêrs bûm, lê wê hevalê tu wate neda hêrsbûna min. Ma wê ji ku bizanibiya ku ez îşev gîhaştime mirad û mexsedê xwe. Ez di wê şeva tarî de rûniştim û ji wê hevalê re xewna xwe vegot. Ez çûbûm gel rêberê xwe. Li pêşiya wî sekinî bûm. Gelek pirs rêz kiribûn û ji min dipirsî?

Lê tişta ku herî min matmayî hiştibû, sibeha min ew xewn dîtibû hevalên reveberiyê bangî min kirin û ji min re gotin xwe amade bike tê demek pir kurt de derbasî qada rêbertiyê bibî!

Piştî van xeyalan, ez bihara sala 1996’an de çûm qada rêbertiyê.

Em komek hevalên jin bûn. Lêhûrbûna derheqê kesayetiya heval Zîlan û Fatma de bû. Rêber’tî encama xeta Zîlan û Fatma dinirxand. Bi rastî jî ez gelek bi bandor bûm. Tevahî hevalên li wir jî gelek bandor bûn. Rêberê me em bi hemû zindiya li benda te ne. Her çiqas ev yanzdeh salin di encama zihniyeta kor û ne fêhm de ti ji me dûr jî bi, em bi te hen e. Em her tim li benda te ne. Dibe ku kevok li bendewariya te bi westin lê em ê her tim baweriya dîtina te bi parêzin û hertim li benda te bin.

www.arsivakurdi.org

# Nameyek germ ji çiyayên bilind

Ji dilê çiyayên azadiyê ez silavên xwe yên bêdawî ji tevayî rêhevalan re dişînim. Di serî de cejna Rêber APO û tevayî girtiyên azadiyê pîroz dikim, rêz û girêdana xwe ya bêdawî nîşan didim.

Her du cejnan, hem cejna Heciyan û hem jî cejna vejîn û azadiyê, cejna PKK'ê li her kesî û bi taybetî jî li tevayî girtiyên azadiyê, berxwedêrên zindanan li her derê pîroz dikim.

***Hevalên hêja...***

Pir caran name û silavên we digihin me, em bi silav û nameyên we dilşad û serbilind dibin. Belkî ku derfeta dayîna hemû navan li vir tunebe, ji ber vê yekê, em hemû hevalên girtiyên azadiyê, li her zindanekê silav dikin. Tevayî hevalên li zindanên Tirkiyeyê û Kurdistanê, hevalên li zindanên Îranê, li zindanên Silêmaniyê, li zindanên Azerbeycanê, li zindanên Sûriyeyê û li her derê silav dikin.

Bi taybetî em li hemberî berxwedaniya hevalên me yên li girtîgehên Sûriyeyê bi taybetî jî zindana Adrayê û girava wan a birçîbûnê bejna xwe ditewînin û rêzên xwe diyar dikin.

Di kevneşopiya dîroka PKK'ê de her tim berxwedanî û qehremaniyan riya pêşerojê afirandiye û pêşiya şoreşê ronî kiriye. Ji berxwedana Mezlum, Kemal, Xeyrî, Akîfan heta berxwedana Îmraliyê û mînaka roja îro li zindana Adrayê ev şopdariyê û berxwedanê dewam dike.

Em gerîla, li çiyayên Kurdistanê di ronahiya berxwedanên rêhevalên xwe yên di zindanan de têdikoşin, ji bo pêkanîna xeyalên rêhevalên xwe yên li zindanan têkoşînê her bilind dikin.


***Hevalên hêja...***

Dijmin her tim hewl daye û dide ku bi riya girtin û zindanan îrade û vîna azadiyê ya şoreşê lawaz bike, lê berxwedaniya rêhevalên di zindanan de, her tim ev hewldanên dijminan pûç kirine û zindan veguherandine kelehên berxwedaniyê û dibistanên partîbûyîn û têkoşînê.

> Di dîroka PKK de her tim berxwedanî û qehremantiyê riya pêşerojê afirandiye. ji Mezlum, Kemal, Xeyrî, Akîfan heta berxwedana Îmraliyê û mînaka li zindana Adrayê dewam dike

Em pir bawerin ku tevayî rêheval di zanabûna rol û misyona xwe ya di têkoşîna bîrdozî de ne. Bi qasî berxwedanî û têkoşîna gerîla, ewqasî jî têkoşîn û berxwedana zindanan girîng û jiyanî ye.

Di serî de berxwedaniya Rêber APO ya bêhempa û tevayî berxwedaniyên rêhevalan ji bo me dibe hêza bilindkirin û xurtkirina têkoşînê... Rêhevalên hêja... bi têkoşîn û berxwedaniyê hêviya me pir mezin e ku em ê rojek ne dûr hev li wargehên azad bibînin.



Bi gelek ji we hevalan re me li qadên şoreşê yên cuda cuda têkoşîn û kar kir, bi gelekan re nas kirin û bîranînên me çêbûn, ew kêlî û bîranîn di dil û mejiyê me de her zindî ne û xwedan nirxên giran û buha ye.

Hevalên hêja... di demên dawiyê de gelek silav û nameyên we gihîştin me an jî me lê guhdarî kir. Bi kurtahî be jî em dixwazin bersiva çend nameyan bidin:

Ji girtîgeha Karataş Adana ya Jinan nameya heval Bêrîvan Sirûç û Serhildan Erzirom berî 10 rojan gihîşt me. Em ji bo nameyên we spas dikin. Di nameyan de him hestên xurt û him jî ramanên bihêz hebûn, tê de kûrbûna di ramanên azadiyê yên Rêber APO de hat dîtin. Di nameyên we de moral, kûrahî û serkeftina ruhî diyar dibû. Em di vê baweriyê de ne ku hûn ê di vê xetê de xwe xurtir û kûrtir bikin. Di xeta fedayîtiyê, têkoşîn û jiyanê de em ji we re serkeftinê dixwazin. Em ê hewl bidin ku di demek kurt de bersiva nameyên we her duyan bidin.

***Hevalên hêja...***

Eger ku heval Tîrêj Siwêrekê li nameya me guhdarî dike, me dixwest agahiyekê jê bigirin. Ku nameyek ji wî bigihîşta me wê baş bibe.

Di dawiyê de em dîsa, di serî de cejna Rêber APO, ya tevayî girtiyên azadiyê, rêhevalên têkoşer, gelê me yê qehreman û welatparêz pîroz dikin.

Di têkoşîn, berxwedanî û jiyana we tevan de serkeftinê dixwazin. Ligel silav û rêzên bêdawî.

***Bahoz Erdal***
***Çiyayên Kurdistanê***

**** Ev name di bernameya Tîrêjên Rojê ya radyoyaya Mezopotamyayê de hatiye weşandin.***

# Pênc komarên Tirkiyeyê

MEDENÎ FERHO

Di nava sedsalên dawî de, dijmin, êrîşî sê nirxên kurdan kiriye. Yek Serokatî ye, du kesayetî ye, sê cografya ye.

Serokatî ji holê rakirin e... Kesayetî şikandin e... Cografya mandele kirin e...

Serokatî nebe rêxistinî çênabe, hişmendiya zanistî nîn e.

Kesayetî nebe, hêvî nîn e, bawerî winda ye, îrade têk çûye...

Cografya nebe dîrok nîn e, mîtolojî, kultur winda ye...

Lê bêyî ku em kûr û dûr bizîvirin; emê îro, li ser êrîşa li dijî serokatiya Tevgera Azadiya Kurd Birêz Abdullah Ocalan û armanca dewleta tirk rawestin.

Demeke dirêj e ku dewleta tirk amadekariyên bextreşî dike.

Desthilatdariya AKP'ê, di bin navê "vekirinê" de, eniya kurd miştixul kir.

Artêşê, polîs û dadgeriyê, bi operasyonên cûreyî, (girtina zarokan û cezakirinên deh salan, parçekirina bedena zarokan jî di nav de) çavên gelê kurd tirsandin.

Dîplomasiya tirk jî, lingê derve amade dikir...

Di encamê de, dewleta tirk, berê xwe da Serokatiya Tevgera Azadiya Kurd... Wilo xuya dike ku, wê êrîşên din û di rengên cûda de bên kirin.

Dibe ku girtina DTP'ê be, dibe ku girtina parlamenteran be... Dibe ku operasyoneke dijwar be... Operasyonên nokteyî... Yan jî, kuştina mirovan...

Dewleta Tirk, piştî ku Rêber Apo Nexşeya Riya Çareseriyê amade kir û radestî rayedarên dewleta tirk kir, bi gotineke "abes" ya pêşiyan; "agir kete wan". Dîtin ku Serokatî, bingeha rêxistinî û hişmendiya zanistî ye... Dîtin ku Nexşeya Riya Çareseriyê, xetên sor destnîşan dike. Ev xetên sor ne tenê ji bo gelê kurd e, ji bo gelê tirk û gelên li Tirkiyeyê teva ne... Dîtin ku, li ser banga Rêber Apo, Komên Aştiyê hatin... Dîtin ku birêz Abdullah Ocalan hîn xwedî bandor û mêjiyê Tevgera Kurd e.

Dîtin ku Komara Tirkiyeyê, namîne Komara Artêşa Tirk...

Dîtin ku Komara Tirkiyeyê, namîne Komara AKP û Fetullah...

Dîtin ku Komara Tirkiyeyê, namîne Burokrasiya Nasyonalîst...

Dîtin ku Komara Tirkiyeyê, namîne Komara CHP'ê...
Dîtin ku Komara Tirkiyeyê, namîne Komara Faşîstan...

Ev navê **5 Komarên Tirkiyeyê** ne... Tev jî, hebûna xwe di tunebûna kurdan û gelên din de dibînin. Binyata wan yek e, xerca wan yek e...

CHP'ê, berî deh salan Rapora Kurd amade kiribû, lê di 13'ê mijdarê de, nûnerê CHP'ê Onur Oymen, qet behsa rapora CHP'ê ya kurd nekir. Behsa komkujiyên li dijî kurdan kir. Ne pêşniyazên di raporê de, hişmendiya Esat Mahmud Bozkurt û bombeyên Sabiha Gokçen pêşniyaz kirin.

Yanî derkete holê ku, rapora CHP'ê ya kurd, di çarçoveya **Raporên Mufettîşên** ku ji bo asîmîlasyon, helandin, koçberkirin û Tirkirina Kurdan amade kirine.

Nexşeya Riya Çareseriyê ya Abdullah Ocalan, kursiyê **5 Komarên Tirkiyeyê** hejandibû. Aşkere nekirin. Aşkere kiribane, ne tenê gelê kurd, gelê tirk û yê din jî dê bikevin nava tevgerê. Ev, ji bo wan talûke bû. Talûke dîtin... Ne CHP'ê, ne AKP'ê, ne Artêşê, ne jî eniya faşîst qîma xwe anî. Dijberiya wan û şerê navbera wan, ji bo xapandina raya giştî û guhertina rojevê ye.

Hêzên dewletê; bi desthilatdarî, muxalefet, medya, burokrasî, polîs, sazî û dezgehên fermî tevan, li dijî rêxistiniya kurd, Tevgera Kurd, li dijî serokatiya kurd, li dijî îradeya siyasî DTP'ê û li dijî medya alternatîf a kurd in... Li dijî, konferansên li ser komkujiyên li Dêrsim û herêmên din yên li Kurdistanê ne... Li dijî Haydar Işik in, li dijî Zubeyir Aydar in... Li dijî ROJ TV ne...

Hêzên dewletê, bi giştî tenê yek tiştî layiqî kurdan dibînin; mafên kesayetî... Lewra, li dijî birêz Abdullah Ocalan, bi armanca dubarekirina dîrokê, pêvajoyek dane destpêkirin. Pêvajoyek dijwar û bi talûke...

Her çiqasî Zerdeşt, yan jî Konfichyûs dibêje; mirov, di çem de, destên xwe du caran nikare bi yek avê bişo jî, dîroka tirkan û kiryarên li dijî kurdan, vê rastiyê nabêjin. Tirkan kiriye û ji wan re maye... Serokên kurdan kuştine, darde kirine û laşê wan jî nedane kurdan, winda kirine. Kurdan heya ku PKK ranebû, 30 salan şer nekir, doza gorên serokatiyên xwe nekirin. Newêrabûn.

Lê niha, kurd, zarok û xwediyên serokên kurd, doza destnîşankirina goran dikin. Di parlamena Tirkiyeyê de jî, vê mijarê tînine ziman. Rayedarên tirk, kohnetiyê dikin, xwe kerr û lal dikin. Kerr û laliya zaliman, diyalektîka kujeriyê ye.

Em tev dibêjin ku **pêvajo giring e**. Serokatiya Konseya Rêvebir a KCK'ê jî, got, "êdî, gotin xelas bû." Saziyên mafên mirovan, kesayetiyên cûda jî daxwaz dikin ku komên serbixwe biçin Îmralî û rewşa Ocalan lêkolîn bikin û cihê Ocalan were başkirin. Gelê kurd jî, daxwaz dike ku Birêz Ocalan serbest were berdan.

Ez, wek mirovekî kurd, ji bilî serbest berdana birêz Ocalan tu riyên din erê nakim. Dîlgirtina Rêber Apo, pêkirina rûmeta gelê kurd e û heya ku serbest neyê berdan jî, rûmeta gelê kurd di bin piyan de ye.

Ev nayê qebûlkirin.

Gelê kurd, ji roja pêşî û heya îro ev yek erê nekiriye û niha jî, li dijî êrîşkeriya birêz Ocalan di nava têkoşîn û berxwedanê de ye. **5 Komarên Tirkiyeyê**, hîn ji kîna li dijî gelê kurd yek gav paşde neavêtine.

Kiryara dawî ya li dijî Rêberê Tevgera Azadiya Kurd Birêz Abdullah Ocalan, xeleka dawî ya kîna li dijî gelê kurd e...

Ji bo kurdan jî yek rê dimîne: Bi dijwarî û çalak, xwedîderketina li rûmeta xwe ye...



Serkeft Botan
serkeftbotan@hotmail.com

## PKK haveynê jiyana gelê kurd e


Heger ku PKK heta niha ku ji kurdan re di hêla însanî civakî ramyarî çand û hunerê de bi awayekî fermî an zagonî ku karyer an disîplîn ava nekiribin jî ji bo siberojê binesaziya wan karyerên civakî xweş kiriye zemînek nermijandî ji civakê re afirandiye. Gelek tiştên ku xeyalên wan ne mimkûn bû jî li Kurdistanê li ber avakirinê ne. Ji bo ku kurd û Kurdistan bi ser nekeve tu sebeb nemane. Hebûn û zayiya PKK'ê zayinek mîladiye ji bo kurdan.


Kesên xwedî însaf û xwedî wijdan guhertin û veguherînên civakî heger ku ne kor bin bi rehetî karin li Kurdistanê bibînin û danuhurînin. Berî PKK'ê civaka kurd di nava tîr û kevanê xwe de li ber helandinê bû û Kurdistan bi çanda tirkîtiyê rû bi rû mabû. Roj bi roj dihate helandin. Di bin siya tirkîtiyê de civa kurd hatibû tewandin û di nava şolîbûna tevayên karyerên neteweyî de jiyan dibuhurand. Bi vejîna PKK'ê re civaka kurd haveynê serguherînên civakî girt û şikil û şemala xwe guhert û pêl bi pêl PKK bû nasnameya kurdên azad û mîna gula ku ji xelevka xwe derkeve li Kurdistanê pişkivî. Civaka Kurdistanê bi haveyn girtina PKK'ê re bû mîmarê civakî û bijişkê (doktorê) birînên xwe. Xwe nas kir civaka xwe nas kir nasnameyên xwe nas kir serok û serokatî ji bo civakekê tê çi wateyê nas kir nirxên rêxistinê û wateya wê nas kir tekoşîn çiye nas kir tiştên xurafatî ji xwe daweşand û xwe ji nû ve ava kir û afirand. Rihê başur bakur û rojavayê Kurdistanê bi ber hev ve anî û xwîna neteweyî bi coş û geş kir. Nijadperestiya tirkan xwe li ber vê têkoşîna gelê Kurdistanê xwe ranegirt û mecbûr ma ku ew jî xwe biguherîne heger ku xapandinek be jî di meclisa xwe de kurd û Kurdistan da nîqaşkirin. Ew niyeta xerap û destmêjgirtin hate şikandin. Ev hewldan ji bo kemalizmê tê wateya mirinê û bi serneketina kemalizmê li Kurdistanê. Ev hewldan ji bo kurd û Kurdistanê di malika erênî de xaleke pozîtîf e. Derizandina kemalîzmê ya li Kurdistanê ye.

PKK morala gelê Kurdistanê gihandiye erşê xwedê. PKK bûye cinnê emperyalan û nijadperestên li cîhanê û dagirkerên li Kurdistanê. Gelê kurd û pêşengiya xwe di dirincika qada nevneteweyî de cihê xwe yê bi xîret girtiye û mîna stêra sibê li Kurdistanê diteyîse û bilind dibe.

Gelên Kurdistanê weke serdemên berê bi rehetî wê neyên xapandin ji ber ku xwedî pêşeng û rêveberiyê ye. Ji ber ku xwedî artêşekê ye. Ji ber ku bi rêxistin e. Ji ber ku xwedî saziyên netewî ye. Ji ber ku xwedî serokekî aqilmend e. Ji ber ku demokrat û hemdem e. Ji ber ku şerkir e û aştîxwaz e. Ji ber ku şopger û aktualist e. Ji ber ku îradeya xwe nema bi tu ol û baweriya tirimpe dike. Ji ber ku pergala koletiyê nema li ser xwe qebûl dike. Dagirkerên Kurdistanê rê û rêbazên xwe yên bi qirêj dixwazin biguherînin û li şûna ku hebûna kurdan înkar bikin kurdên ku xwe nas kirine û ku xwedî îrade ne wî kesî ji holê rakin û qeyran û kaosa ku di salên 1992-3 û 4'an de dimeşandin komseptek bi vî awayî dîsa di nava civakan kurdan de bimeşînin. Ev jî tê vê wateyê ku dagirkerên Kurdistanê hîn bi mantixa qirbûn û tunehesibandina berê tevdilivin û serxweşiya şowenîzmê û nijadperestiyê ew ker û etim kirine. Dagirker dagirkerên berê ne lê kurd ne kurdên berê ne. Kurdan ew rengdêriyên jorîn ku hatin jimartin tev di xwe de bi cih kirine. Ciwanê kurdan ê birêz Ihsan Fetehiyan profîla gelê Kurdistanê ya sedsaliya dahatuya wan ji dagirgeran vegot û pêhna xwe li kursiya jiyanê da.

www.arsivakurdi.org




# Heke jin xwe neparêze kesek nikare wê biparêze

Mirovekî gundî her tim û dayîm jina xwe gunehbar dike û jê re dibêje dost û yarê te hene. Tu min dixapînî, ew qet ji hundirê malê dernakeve nare kar û îşekî xebatekê nake, li ber jina xwe nobetê digire.

Jina wî jî ev sûc û gunehbarkirina wî ji xwe re qebûl nake û jê re dibêje dost û yarê min tune ye ez te naxapînim. Here kar û îşê xwe bike. Mêrê wê dibêje, na ez ê li ber te nobetê bigirim bila dost û yarê te qet neyên cem te ez narim kar û xebatê û ew li malê dimîne. Ev tebîetê wî jinikê gelekî aciz dike.

Ew radibe di paceyê de gazî mirovekî li kuçeyê dike, mirov tîne dixe axûrê.

Dûre teşta arvan tîne datîne erdê û destê xwe dixe nava arvan, destê wê tev dibê hevîr.

Ew ji mêrê xwe re dibêje mêro destê min tev de bûye hevîr wele. Destava min tê, hela were derpiyê min ji min bike, ez herim axûrê destava xwe bikim.

Mêrik tê derpiyê wê ji wê dike…

Ew dere axûrê bi wî mirovê xerîb re radikeve, ew mirov dîsa bi ser riya xwe de dere û jinik vedigere tê cem mêrê xwe, jê re dibêje min destava xwe kir kanê derpiyê min li min ke.

Mêrê wê dîsa derpiyê wê li wê dike..

Ew ji mêrê xwe re dibêje te nika tiştek dît.

Ew dibêje na min tiştek nedît ji xwe ez li ber te nobetê digirim tu kesek nikare were yan jî here.

Jinik jê re dibêje de binêre min di paceyê de gazî mirovekî xerîb kir, min wî anî xist axûrê dûre min ji te re got destê min bi hevîr e te bi destê xwe derpî ji min kir ez çûm axûrê min û wî mirovê xerîb tev de bi hev re çi kiribe tu ji ku zanî.

Piştre jî ez hatim dîsa te derpiyê min li min kir. Yanî heke dilê min û tiştekî wiha hebe tu bi vê nobeta xwe nikarî pêşiya min bigirî.

Dost û yarê min tune ye. Ev demek e tu li ber min nobetê digirî ev nobeta te bêfêde ye.

Ya baş ew e ku tu wekî mirovan biçî karê xwe û dest ji vê dilxirabiya xwe berdî. Ew tu fêdeyê li te nake. Here kar û îşê xwe, heke ez xerabiyê bikim tu nikarî min biparêzî li ser vê gotin û pêkanînên jinikê, mêrê wê jî jê re got rast e û got heke jin xwe neparêze tu kesek nikare wê biparêze.

Ya baş ez bi ya te bikim û dest ji vê nobeta xwe ya bêwate berdim.

Mêrikê dilxirab dîsa çû kar û îşê xwe, û jinik jî rihet li mala xwe rûnişt û nema derdê mêrê xwe kişand.

*Naîl Demîr*




# Şerê dewletê û rantxurî

HEJARÊ AMEDÎ

Merheba gelî hêjayan

Ji ber ku Şêx Zubêr nikare vê hefteyê binivîse barê wî ket ser milê me, gelekî meraq nekin ew hebekî nexweş e û pozê wî diherike, qirika wî dişewite, germahiya laşê wî bilind e, êdî nizanim ne şewba mewsimî ye, ne êşa mirîşka ye, an jî xwedê neke êşa beraza ye. Dibe jî ku rexneyên Dilgeş tehemul nekiribe û ji ber wan nexweş ketibe. Bi her halî xwedê lê were rehmê û şîfayê jê re bişîne. Bi destûra we be em derbasî mijara xwe bibin.

Belkî tê bîra we tevan bi taybetî kesên ku mediya tirk dişopînin, di dema ku nû hikûmeta tirk balefirên casûsiyê yên bi navê Heron ji Israilê kirîn, çi dahol û zirne li dar xistibûn û digotin êdî çiyayên qendîlê ji wan re bûye weke malekê ku bi kamereyan tê şopandin û ew ê hemû tevgerên gerîlayên kurd bişopînin. Lê derkete holê ku ew jî tenê beşek ji bazirganiyê bû ku hikûmeta tirk pê dilê hikûmeta Israilê xweş kir û bi tirilyona pere ji bo kirîna wan firokan dan Israilê. Niha jî li gor nûçeyekê ew deh firokên Heron ên ku ji Israilê hatibûn kirin 6 ji wan li Israilê tên vegerandin. Çima 6 tenê tên vegerandin ji ber ku 4 ji wan Heronan ji alî gerîla ve hatin xistin û imhakirin.

Îca niha van rojan li şûna Heronan mediya tirkan îca behsa alîkariya FBI dike ku serokê wê Robert Mueller berî çend rojan li Tirkiyeyê bû. Mueller ji Ankarayê soz daye tirkan ku ew ê bi rengekî çalaktir êdî li dijî PKK bikevin nava xebatê. Îca gelo vê carê çiye, Gelo wê Amerîkayê çekên ji Heronên Israilê çalaktir bide tirkan an jî ew jî wê bazirganiyeke din a bi trilyonan bi hikûmeta AKP re bikin bi behaneyê şerê li dijî "terorê". Fatoreya giran a vê yekê jî herdem li ser pişta gelê Tirkiyeyê ye. van pereyên ku li şer tên serfkirin heke ji bo gel werin xerckirin wê hemû alozî û problemên aborî ên gelê Tirkiyeyê werin çareserkirin.

Niha dewleta tirk bi navê açilim û vekirin an jî ji qewla şêx ve xwevekirinê hin gavên pûç û xapînok avêtin. Di nava van gavên qaşo rêvekirina li ber çareseriyê cihguhertina Serok Apo bû. Lê mixabin me tevan li ber çavan dît, ew çareseriyeke çawa bû. Bi navê çareserî û vekirinê şert û mercên serok Apo ji berê xirabtir kirin û tecrîda li ser dijwartir kirin. Hemû gavên vê hikûmeta xapînok wiha ne. Ev vekirin, açilim, rêvekirina li ber çareseriyê tev wiha ne û tu niyeta baş a vê hikûmet di warê çareserkirina pirsa kurd de ne xuyaye. Lewra jî divê kurd xwe li gor rewşa nû amade bike û têkoşîna xwe ji her alî ve bilindtir bikin.

# XAÇEPIRS

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 2 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 3 | | | | | | | ■ | | |
| 4 | | ■ | | | ■ | | | | ■ |
| 5 | ■ | | | ■ | | | | | |
| 6 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 7 | | ■ | | | | ■ | | ■ | |
| 8 | | | ■ | | | | | | |
| 9 | | | | ■ | | | ■ | | |

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Dewara nêr... Cînavka pirhejmariyê ya xwerû... Rengek, binevşî **2.** Pêxemberek... Xweliya piştî şewatê **3.** Ji şêstan yekê deqeyê... Zîl, kulîlkên nû vedibin re tê gotin **4.** Cihê herandinê... Notayek **5.** Rojek... Cihê ku sewal lê westa xwe datînin **6.** Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin... Demên rojê... Pirç **7.** Di dîrokê de dewleteke kurdan **8.** Cînavaka kesê yekemîn a yekjimar... Bajarekî me **9.** Keç... Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye?... Notayek

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Karika di navbera şeş mehî û salekê de... Bajarekî me ku bi sûrên xwe navdar e **2.** Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin... Cejn, eyd... Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd. **3.** (Memê ...) Destaneke me **4.** Kar û xebat... Fen û fût, hîle **5.** Alava ku pê hespan tîmar dikin... Beraza mê **6.** Orjînal... Yezdanekî misrî **7.** Notayek... Baneşana kêfxweşiyê... Li Colemêrgê gotina 'yek'ê **8.** Dinya, cîhan... Nexweşiyek **9.** Kanaleke televîzyona kurdî... Asta bilind (merheleya herî jor)

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | X | A | L | ■ | O | X | ■ | A | D |
| 2 | Î | N | ■ | A | J | ■ | A | L | Î |
| 3 | Ç | O | V | ■ | E | S | M | E | R |
| 4 | ■ | N | ■ | K | ■ | B | Û | M | ■ |
| 5 | S | Î | P | A | N | ■ | R | ■ | B |
| 6 | Ê | M | ■ | M | A | K | ■ | T | O |
| 7 | R | ■ | K | A | M | A | R | O | T |
| 8 | T | R | ■ | R | E | ■ | A | L | A |
| 9 | ■ | A | W | A | ■ | P | Z | ■ | N |





# Nîvrojeke du hevalan

KEWŞEN HERÎ

Demsal havîn e, danê esrê ye, roj hedî hedî diqulibe lê hê jî germahiya wê neşikestiye, mirov aciz dike. Tîrêjên tavê rengekî sar û şikeştî dide erdê. Mîrov li kolanan wek tûlên beradayî diçin û tên, yek caran li hev diqelibin. Hin kes li bin daran rûniştine, diaxivin, hin kes bi dost û yarên xwe re mijûl dibin, hinek evîndar hev miz didin, hinek hev maç dikin. Wisa dixuye jiyan li xweşa wan diçe. Parka hêşîn te digot qey rengê xwe daye jiyana wan. Her kes bi kêf û ken dixuya. Li hemberî parkê avahiyeke pênc qat û qatê pênca bîraxanê. Jîndar û Nejbîr rûniştine, li ber pacê li derve; li parkê û mirovan temaşe dikin. Jîndar qulmek ji bîraya xwe vexwar û cixara xwe hilda devê xwe, li Nejbîre nihêrî, biken pirsî:

- Tu çi dibînî li derve?

Nejbîrê bîra xwe hilda rakire ser devê xwe, di carekê de xilas kir. Bbi hêrs li dervw nihêrî û got:

- Ez ê çi bibînim li vî bajarê bê namûs?

Jîndar dizanibû kêfa Nejbîrê tune ye, dixwest hinekî pê re bileyîze. Li çavên wê nihêrî, destê wê girt, jê re got:

- Ma tu çima wisa dibejî? Ka binêre mirov çawa bikêf in û şa dibin. Ev tiştên xweş in, ew jî ji vî bajarî ne.

- Erê ez jî zanim ew ji vî bajarî ne, loma ev bajarekî bênamûs e. Ev hevok bi hers ji devê Nejbîrê derket.

- Çima lê? Jîndar bi hêsanî jê pirsî. Pirsên Jîndar zêdetir hêrsa Nejbîre dianî.

Nejbîrê êdî tamîş neda, çavên xwe girt devê xwe vekir û got:

- Jîndar te çi zû do ji bîr kir, ne dûr do ji bîra te çû.

- Na do ji bîra min ne çû lê ew bûyereka kirêt bû derbas bû çû. Sebra Nejbîrê nemabû, denge xwe bilind kir:

- Çawa derbas bû bi ku de çû? Tu çawa dibêjî bûyerek e. Ev bûyera çenda ye? Hindik mabû em hemû bimirina.

Jîndar dît rewş xetere ye dengê xwe birî. Îcar bêdengî Nejbîrê xira kir, keniya û got:

- Bêdengiya van mirovên te yê xweş dibe sebeba van bûyeran. Ev jî wan dike bênamûs. Û ev rihetiya te jî min dîn dike. Ez ê dev ji zanîngehê berdim, herim, ne hewce ye.

Nejbîr rabû bi lez derket, çû. Jîndar rabû ku bide pey lê wekî yek pê bigire dîsa rûnişt li cihê xwe yê berê. Şûşa bîra xwe hilda, berê devê xwe da, şûşa vala danî ser masê. Gazî garson kir û jê bîra xwest. Garson çû jê ra bira bîne, ew rabû çû li dewsa Nejbîrê rûnişt. Garson şûşa bîrayê anî danî ber wî, metel ma, vegerî çû bi dengekî nizim got, ev dîn e çi ye. Deng çû Jîndarê lê xwe nekir, keniya, bi dengeki nizim. Jîndar destê xwe avêt şûşa bîrayê bire devê xwe. Jê qulmek hilda, bi zorê daqurtand, qirika wî tijî bûbû bîra nediçû xwarê, sedem ne bîra bû kelegirî bûbû xwe negirt hêsrên xwe berdan. Dilopek ji çavê wi yê çepê hêdî hêdî ber jêr dihat. Nejbîrê li dilopa çavê Jîndar dinêrî. Nizanibû ew dilop ji bo çi hatibû xwarê. Gava din jî kêfa wî li cî bû. Ev dilop ji ku derket. Fikirî ku çûyîna wê bûbe sedem. Na, na ev dilop ne ji bo min e got. Jîndar mîrovekî histiyar nîn e ku ji bo min bigirî. Ev birîneke din e edî tamîş neda da der. Lê çima bi min re parve nake, çima haya min jê tune ye. Nejbîr paşve vegeriyabû hatibû hemberî Jîndar. Cihe Jîndar ê berê û di nav van hest û ramanan de Jîndar temaşe dikir. Jîndar serê xwe bilind kir ku desmalekê hilde pê pozê xwe paqij bike, Nejbîrê ji çentê xwe desmalek derxist, direj kir. Jîndar desmal hilda, serê xwe xiste ber xwe û got:

Xwe li erdê dirêj kir. Kêlîkekê serpişt direjkirî sekinî, tebatî pê re nemabû, rabû ser xwe çû muzîk vekir. Dengê wê anî dawiyê, zivirî kêlaka xwe, li refa pirtûkan nihêrî

- Tu çi wext vegeriyayî?

- Wexta dilop nû dihate xarê.

- Rastî dibêjî?

- Erê rastî dibêjim. Xêr e ev girî ji ku derket?

- Xwe dilê min xwest min jî xwe negirt.

- Xwezî ez jî bigiriyama, belkî hinekî rihet bûma. De rabe em herin. Dereng e, te xwe rihet kir.

Rabûn bi hev re derketin derve. Roj qulipî bû. Hêdî hêdî tarî dikete erdê. Jîndar ji van demên êvarê zaf hez dikir lê li vî bajarî zêde newiribû bi şev bigeriya. Zivirî ji Nejbîrê re got, hela hê zû ye. Hez bikî em hinekî bigerin li cadeyê, paşê tu mala xwe ez mala xwe. Hê neketibûn cadê çend kesan pêşiya wan girt, ji wan re gotin hûn çima bi tirkî naaxivin, zimanekî dinê diaxivin? Jîndar û Nejbîrê li hev mêze kir, paşê nedixwestin bûyer derkeve. Tiştek negotin, çûn. Kesên ku peşiya wan kirtibûn li pey wan çend tişt gotin lê wan xwe lê nekir xweyî. Te digot qey ew pirs ji valahiyê re bûn ne ji wan re. Nejbîrê ji Jîndar re got, were em herin bira ew ji xwe re biewtin, wek kûçikan. Kûçik ji wan çêtir in. Çûn, Nejbîr derbasî mala xwe bû. Jîndar jî vegeriya çû mala xwe.



Jîndar bi hêrs derî vekir, derbasî hundir bû, dêri li ser xwe girt. Li odê kincên xwe derxist, avêt ser mînderê. Xwe li erdê dirêj kir. Kêlîkekê serpişt direjkirî sekinî, tebatî pê re nemabû, rabû ser xwe çû muzîk vekir. Dengê wê anî dawiyê, zivirî kêlaka xwe, li refa pirtûkan nihêrî, pirtûkek girt, zivirî cihê xwe yê berê. Wekî berê xwe serpişt dirêj kir. Pirtûk vekir û dest bi xwendinê kir. Çavên wî li pirtûkê guhên wî li muzîke bû. Bi destê xwe yê çepê pirtûk girtibû, destê rastê li ser rûyê xalîçeyê digerand. Li tiştekî digeriya, dest pêşî ber bi xwelîdankê ve çû, xwelîdank hilda danî ser singê xwe. Dest dîsa derket gerê. Îcar ber bi cixarê ve çû, devê pakêtê vekir cixareyek jê derxist, bire devê xwe û pêxist. Qulmekê li cixarê xist, dûyê wê berda nav odê. Wekî hinekî bîhna wî hatîbû ber wî.

Ji nişkê ve dengê lingê hinekan hat. Fikirî ku dibe Nejbîr hatibe. Bi dengê lingan bistikekê dilê wî bi coş bû, paşê têgihîşt ku ev ne dengê lingê jinan e, ne jî dengê lingê mîrovên normal e. Dengekî hişk û zexim bû. Dengê lingan wek dengê botên leşkeran bû. Tirs kete dilê Jîndar, nizanibû çi bikira. Dest û lingên wî li hev geriyan. Derî lê dixist, mecbûr bû ku derî veke. Jîndar derî vekir, ew bêdestûr ketin hundir. Her der tevlihev kirin. Jîndar hildan birin. Jîndar bi dizîka li aliyê xwe yê rastê nihêrî, Nejbîr dît. Di nava ewqas kesî de çavên wî li Nejbîrê digeriyan. Nejbîrê jî bi tirs li Jîndar mêze kir. Çavê xwe qirpand, Jîndar xwe negirt keniya bi dengekî bilind. Polîs jopa xwe rakir ku li ser pişta Jîndar bixe, bû tîqetîqa wan, devê polîs vekirî ma, jopa wî kete erdê.

# Mêwek tirî bûm

*Mêwek tirî bûm li gundê Batrîgê.*
*Geş dibûm bi ava Dîjlê.*
*Hênik dibûm bi bayê deştê.*
*Sermest dibûm bi şalûl û bilbila.*
*Yara min dixemilî bi tûtş evîna.*
*Şekirê dimsa min,*
*Diheliya bi germahiya tebaxê.*
*Û dibû şerbeta*
*Derwêş,*
*Ozan,*
*Û dengbêjan.*
*Mêwek tirî bûm li deşta Amedê.*
*Ji gel re şêranî,*
*Ji neyar re tehl û tirş bûm!*
*Ji berxwedanan re star,*
*Ji neyar re tirs û xof bûm.!*
*Mêwek tirî bûm di hembêza*
*Kurdistanê de.*
*Wey bêbexto!!*
*Tu jî ji goşiyê min libek bûyî.*
*Ji bo hilmek cixarê,*
*Te êrîşê min kir wek gurê birçî!*
*Wek barana çile,*
*Te barand çar hêlên min!*
*Dil pîşo, te rût kir deşta min!*
*Yara min bê goşî!*
*Mîna hêlîna cotkewê bêjî*
*Û te hişt lepek hewşa şewitandî.!*

*AHMET TAMÎR*



Rupel 12++++++:Layout 1 01.12.2009 14:35 Page 1

ROJEV

2 Kanûn 2009 Hejmar: 20 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com

# 'Bila pêşî li gazên serayê bê girtin'

Neteweyên Yekbûyî (NY) ji ber ku pêşî li gaza serayê bigire û atmosfer gemar nebe pêşniyareke ji civîna ku li Danîmarkayê ji bo pêşîlêgirtina gaza xwezayê pêk tê kir. Di pêşniyarê de dixwaze li gor pîvanên sala 1990'an heta sala 2050'î gaza serayê ku atmosferê gemar dike ji sedî 50 bê kêmkirin.

Li Danîmarkayê di navbera 7 û 18'ê kanûnê de dê cîneke pêk were. Her wiha dê ji bo pêşnûmeyek jî pêşkêş kirin. Di pêşnûmeyê de tê xwestin ku ji bo ku pêşî li gaza serayê bê girtin divê ji sedî 80 dewletên dewlemend li ser vê zêdetir bisekinin. Her wiha di planê de tê xwestin ku divê her kes baldar be ku dê di sala 2020'an de gaza sereyê bigihêje asteke jor.

Lê mixabin di pêşniyara Danîmarkayê de dewletên dewlemend ji bo belavbûna gaza serayê tu tiştekî pêşniyar nakin.

Di pêşniyara Danîmarkayê de jî tê gotin ku divê germaniya global 2 dereceyî derbas neke û her tim bi sînor be.

Çav li riye ku 65 serokê dewletan tevlî vê civînê bibin. Her wiha ji niha de çav li riye ku peymaneke hiqûqî bê îmzekirin. Serokê Danîmarkayê Lars Lokke Rasmussen peymaneke ku ji 5-8 rûpelî pêk tê dixwaze. **KOPENHAG**





# Ne şîrketan gerdûnê biparêzin




Bi armanca ku asta karbondîoksîtê dakeve 350 ppm'î di 12'ê kanûnê de tevgerên hawirdorê dê li seranserên cîhanê çalakiyê pêk binin. Tevgerên hawirdorê di Facebookê de komeke bi ser navê 'Ne şîrketan, gersitêrkan xilas bikin' vekirin û ji bo çalakiyên bang kirin.

Li hemberî civînên ku li Danîmarkaya Kopenhangê pêk tên li seranserê cîhanê dê çalakî pêk werin. Her wiha çalakî dê di serî de li Kopenhagê û bi giştî li cîhanê pêk were. Tevgerên Hawirdorê dê li aliyê cîhanê çalakiyan pêk bînin û her wiha xebatên wan bênavber didome. Çalakî dê li Tirkiyeyê jî pêk bê. Çalakiya ku li Tirkiyeyê pêk tê jî ji aliyê tevgera hawirdorparêzan ve tê organîzekirin. Koma Çalakiyên Global di serî de li Îzmîr, Stenbol û hemû Tirkiyeyê ji bo tevlîbûna çalakiyê bang kirin. Her wiha komê di Facebookê de bi ser navê 'Ne şîrketan, gerestêrkan xilas bikin' komek vekir. Pergala kapîtalist ku ev 200 sal e ji madeyên fosîl enerjiyê pêk tîne gef li hemû jiyana kesî xwariye. Tevgera Hawirdorparêzê ya Tirkiyeyê daxuyaniyek da û wiha got: "Li cîhanê hemû hevsenga cîhanê serobin bûye. Êdî lehî, şewat, afet, hişkesalî û nexweşî her diçin zêde dibin. Ev tiştên ku me rêz kirin yek jî ne xwezayî ye."

> Tevgerên Hawirdorparêzê ji bo ku asta karbondîoksîtê dakeve 350 ppm'î dê li seranserê cîhanê çalakiyan pêk bînin. Li Tirkiyeyê jî dê di vê çarçoveyê de çalakî pêk bên

**'Ji bo pêşî girtinê dem heye'**

Di berdewamiya daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku ji bo ku ev felaket raweste hêj dem heye û wiha berdewam kir: "Ji bo ku asta karbondîoksîtê kêm bibe dê hemû em bi ser dewletan de biçin. Ji ber vê em bang li hemû rayedarên dewletan dikin. Bila di civîna Kopenhagê de biryarên pêwist bên girtin. Bila ev guherîna avhewayê biguhere. Armanca me ev e ku asta karbondîoksîtê bikeve 350 ppm'î. Bila destûrê nedin bazirganiya Karbonê. Ji bo ku germaniya global raweste divê hemû alî enerjî, teknolojî û çavkaniyên malî nekin mijara bazarê." **ÎZMÎR (DÎHA)**

# Batmansporê Sîirtspor têk bir

72 Batmanspor ji bo maçê bû mîvanê Sîirtsporê. 72 Batmanspor 2 gol avêt Sîirtsporê. Her gol jî gogbaz Omer avêt û Sîirtspor 2-0 têk bir. 30 deqeyên pêşî bi têkoşîna qada navîn derbas bû. Di deqîqeya 33'emîn de ji Sîirtsporê Cihan bi sedema ku cota qerta zer dît, ji aliyê dadwer ve ji lîstikê hate avêtin û tîma xwe 10 kes hist.

Di deqeya 38'an de gogbazê 72 Batmansporê Omer ji derveyî qada Sîirtsporê ya cezayê li gogê xist û bi golekê tîma xwe 1-0 li pêş xist. Dewreya yekem bi 1-0 bi dawî bû.

Di dewra duyem de 72 Batmanspor bi performansa xwe ya serkeftî ji alîgirên eleqeyeke germ dîtin. Sîirtspor ji erîşên kontrayî û gogên rawestî li golê geriya lê qeleparêzê Batmanê Tuncay di qela xwe de bû dew û rê neda gola Sertê.

Di deqîqe 70'emîn de stêrkê maçê Omer dîsa derket sahayê. Bi pasa çewt a qeleparêzê Sertê Omer gog girt û gol avêt.

Piştî vê golê Sîirtspor ji dîsîplîna lîstikê ket û 72 Batmanspor li hemberî reqîbê xwe yê bihêz 3 pûan xwe zêde kir.

**Gogbazên ku di maçê de lîstin**

***72Batmanspor:*** Tuncay, Hayrettîn, Abdullah, Îdrîs, Cuma, Îbrahîm, Mehmet Uzun (Dq. 57 Hatîp), Mesut,Omer, Mert (Dq, 83 Sercan), Devran (Dq. 61 Mehmet Guneş)

***Sîirtspor:*** Tayfun, A.Kasim, Volkan(Dq. 65 Tufan), Muhammer(Dq. 76 Ugur), Sezer(Dq. 46 Raşîtt), Omer, Çagdas, Mehmet, Metîn, Cihan, Veysel

***Qerta sor:*** Dq. 33 Cîhan(Sîirtspor) **ÊLIH**

# Pîra 135 salî li Kurdistanê dijî

Li navçeya Pasûra Amedê, derket holê ku pira bi navê Helîme Olcay temenê wê 135 e. Lê heta niha, ne haya Pirtûka Rekoran a Guinnessê jê hebûye û ne jî haya daîreya nifûsê ya Pasûrê. Qeymeqatiya navçeyê û gelek kes ji pîra Helîme, ku mimkûn e li seranserî cîhanê kesa herî temendrêj be, nû agahdar dibe. Pîra Helîme Olcay, gelek bûyerên dîrokî yên cîhanê dîtiye û di sala 1874'an de ji dayîk bûye. Şerên cîhanê, rûxandin û avabûna gelek welatan dîtiye û şahidiya dema Osmanî û derbasbûna Komara Tirkiyeyê jî kiriye. Sira temendrêjiya pîra Helîmê: "Me çi dît me ew xwar" Li gor agahiyên xizmên wê, niha ji odeyekê de dimîne û êdî bêtaqet maye. Neviyê neviyên xwe dîtiye û ji ber vê yekê jî, li gor baweriya Îslamê pileya "nevîtext" bi dest xistiye. Pîra Helîme, ji ber temenê xwe yê têrdirêj, ji derdorê jî gelek rêz dibîne. Dema rojnamevan jê dipirsin, "Sirra temenê te yê dirêj çi ye?" Vê bersivê dide: "Min çi dît, min ew xwar" **AMED**

# Li tansiyona xwe baldar bin



Ji bo di nav temar de xwîn biherike divê çewsek hebe. Vê çewsê bi givişkbûna dil xwîn pompeyê temaran dibe û bi vezena şahreg sîstemên dengeya vê çewsê pêk tîne.

Dema dil givişk dibe çewsekê çêdike û xwînê dixe nav şahregê. Di vê navberê de çewsa di nav temar digihîje radeya herî bilind. Ji vê çewsê re bi zimanê bijîşkî dibên "tansiyona sîstolik", di nav gel de jî "tansiyona mezin" tê gotin. Bi sistbûna dil xwîna ku pompeyê nav temar dibe disekine. Di vê navberê de jî vezena temar dikeve dewrê. Temara ewil fireh dibe, çewsek dide xwînê û bi sistbûna dil re jî herikîna xwînê pêk tîne. Di vê demê de jî ji çewsa herî kêm re di bijîşkiyê de "tansiyona dîastolîk", di nav gel de jî "tansiyona biçûk" tê binavkirin.

Di bijîşkiyê de bi gelemperî cudabûna hêza laşê her mirovê divê mirov zanibe. Ji ber vê yekê nirxên pîvanên her mirovê jî cuda ne. Ger mirov bixwaze kêmbûn an jî zêdebûna tansiyona xwe bide pîvandin, ew mirov beriya gazinc an nexweşiyên xwe dema bi tenduristî ye tansiyona xwe bipîve û vê pîvanê li ba xwe wek nîşe bigire ji bo wî baştir dibe.

Li gor encama lêgerînan, bi zêdebûna temenê tevlî guherînên biçûk, ji bo tansiyona mezin ger 120 û 140 an jî di navbera 12 û 14 be, ji bo tansiyona mezin jî di navbera hejmarên 70–90'an jî 7–9 be ji bo tendurustiya mirov xeteriyek tuneye.

Di rewşên tansiyona niqira pirole de, temara mejî diteqe û tevlî xwînê ron jî ji mejî tê û di mejî de dibe sedema pêkanîna perç. Ev jî ji bo mirov xeteriyek herî mezin e.

Yên tansiyona wan zêde ye dikarin tedbîrên wisa ji bo xwe bigirin:

Dikarin xwê kêm bikin, xwe bigihîjînin kîloya normal ya jî bo wan pêwîst e, ger cigare dikişînin, divê berdin, ger mirov xwediyê jiyaneke bêtevger e divê ji bo spor dem veqetînin, laşê xwe bixebitînin. A dawî jî divê mirov xwe ji stresê biparêzin. **AMED**

# Li Îngilistanê salê 10 hezar kes dimirin



***Li Îngilistanê*** bi armanca ku bi nexweşiya pençeşêrê têbikoşin servîsa hikûmetê hatibû avakirin. Serokê servîsê diyar kir ku ji bo ku nexweşiya pençeşêrê dereng tê teşhîskirin li Îngilistanê her sal 10 kes ji vê nexweşiyê dimirin. Serokê servîsa hikûmetê ya li hemberî nexweşiya pênçeşêrê têkoşîn, Prof Mîke Rîchards daxyaniyek da û anî ziman ku eger ku ev nexweşî zû bihate teşhîskirin ev kesên bi nexweşiya pençeşêrê ketine bihatana xilaskirin. Rîchards wiha dirêjî da axaftina xwe: "Li Îngilistanê tu kes ji ber pirsgirêkên xwe yên tenduristiyê zû bi zû naçin nexweşxaneyê. Mixabin ev jî jiyana wan dike bin rîskê. Rê li nexweşiyan vedibe. Hewldana me ev e ku em teşhîseke lezgîn biafirînin." Li gorî daneyên fermî di sala 2007'an de 34 hezar û 589 kes ji ber nexweşiya pençeşêra pişikê mirin. 16 hezar ji pençeşêra roviyan û 12 hezar û 82 kesî jî ji ber pençeşêra memikan jiyana xwe ji dest daye. **LONDON**